



Alî Qazî: "Helwesta PDK'ê pîştî ku hêzên tirk ketin Başûr guherî. Kes nikare bibêje PKK ne rêxistîneke başûrî ye, Bêyî PKK'ê aşî pîr nayê. Dibe ku yekîtiya neteweyî bi pêşengiya PKK'ê pêş were. Ji bo ku Kurd di Kurdistanê de bi dilşanî û berêrazî bijin Kongreyê Neteweyî rawîst e. Divê a tîr Kurdan bi destê Kurdan çalî were."

AŞÎ Û YEKÎTIYÊ KÎ NAXWAZE?

R. 3

Sekreterê Giştî vê ICD:

"Mîrza Mihemed ji bo me serokê rûmetê ye"

R. 3

Lêkolîn-Gabar Çıyan

Asûrî xwediye çandêke qedîm in


R. 45

Vîranîn:

Hîrê şehîdên ma
Hişyar, Xetîp û Cîhat

R. 6

Azadiya **WELAT**



SAMI TAN

Çapemeniya daxuyaniyên fermî

Ew rewşa çapemeniya tirk, hêjayî lêkolîna derûnînasan e, lewre rengê nexweşiyêke civakî lê dikeve. Her wiha ew nexweşî bi destê çapemeniyê li nav hemû civaka tirk tê belavkirin

Çapemeniya tirk, bi xurtbûna çapemeniya kurd re, di warê meşandinê taktikên şerê taybet de ketiye tengasiyêke mezin. Bi taybetî piştî ku televîzyona kurdî MED-TV'yê dest bi weşanê kir, karê çapemeniya tirk diwartir bû.

Derketina MED-TV'yê çeper li medyaya tirk teng kir. Berê diçûn bi Serokê Giştî yê PKK'ê re hevpeyvîn dikirin, lê ew dianîn li gorî berjewendiyên xwe diweşandin. Niha êdî nikarin vê yekê bikin, di cih de heman hevpeyvîn di televîzyona kurdî de jî tê weşandin. Her wiha berê diçûn hinek soz didan, xwe wekî dost nîşan didan, lê piştî ku vedigeriyan dijminatî dikirin. Îro nikarin vê yekê jî bikin.

Êdî rojnamegerên tirk bi berpîrsên tevgera kurd re hevpeyvînê nakin. Li nik sedema ku me li jor, bi lêv kir, ramanêke sosret a rojnamegerên tirk jî dibê sedema vê yekê. Lewre êdî ew wekî dewleta xwe, "bi PKK'ê re li hev rûnanin." Li gorî baweriyê wan dema ew beşdarî civîna çapemeniyê ya PKK'ê bibin, wê PKK "meşrû"

bibe. Li aliyê din dema ew civîn di MED-TV'yê de bê weşandin, pîrsên ku ew dikin jî wê ji aliyê her kesî ve bînin dîtin, heke pîrsên wan ne bi dilê generalên tirk bin, ewê hetika wan bibin. Ew jî di nava her kesî de nikarin, pîrsên bi dilê general bikin, nexwe wê rika kurdan bikişînin ser xwe, di ser de jî wê bibin mijara henekên rojnamegerên navneteweyî.

Ji ber vê yekê, rojnameger û nivîskarên tirk, agahiyên ji çapemenî û televîzyona kurd digirin, lê dibêjin: "Me ew agahî ji hêzên ewlehî bi dest xistine." Mijarên ku di nav raya giştî ya kurd de bi awayekî vekirî tên nîqaşkirin û civînan ku berî mehekê di MED-TV'yê de hatine weşandin, wekî agahiyên ku di nava PKK'ê de bûne sedema şer û pevçûnan tên nîşandayîn.

Li aliyê din divê bê gotin ku ji ber vê helwesta rojnameger û nivîskarên tirk, belavokên fermî yên hêzên dewletê di çav kesên navborî de bûne belgeyên herî girîng û pêselmîn. Nûçegihanên polîsan û leşkeran di rojnameyan de qucîkên

sereke ji xwe re terxan kirine. Dema yek daxuyaniyekê berî yekî din bi dest dixwe, mora "nûçeya taybet" li bin dixwe û bi vî şeweyî diweşîne. Hêzên dewletê jî ji ber ku vê girîngiya daxuyaniyên xwe dizanin, heman agahiyê didin hemû rojname û televîzyonan. Lewre jî rewşeke qerfokî derdikeve holê; ew agahî di hemû rojname û televîzyonan de dibin nûçeya taybet.

A rast, ew rewşa çapemeniya tirk, hêjayî lêkolîna derûnînasan e (psîkolog), lewre rengê nexweşiyêke civakî lê dikeve. Mixabin ew nexweşî bi destê çapemeniyê li nav hemû civaka tirk tê belavkirin. Civaka ku bi daxuyaniyên fermî bê timarkirin, bi xetereyêke mezin re bi rû bi rû ye.

Bextewariya me kurdan ew e ku, em ji bandora vê nexweşiyê dûr in, lewre çapemeniya kurd a rojane rastiyan belav dike û me ji vê nexweşiyê diparêze. Lê divê em bi her awayî li çapemeniya xwe xwedî derkevin, nexwe emê jî bibin koleyên daxuyaniyên fermî.

Demokrasiya durû

HAYDAR GÜNDÜZ

Ferhengok

amûr: navgîn, hacet
aya: gelo, acaba
bêpar: mahrûm
bêgavî: neçarî, mecbûriyet
binyat: kok, esl
boçûn: dîtin, raman
çhanbînî: bîr û raman
çiyawez: cuda, bi ferq
dafik: xefik, faq
damezirandin: avakirin
debar: dilig (geçim)
dezgeh: sazî (kurum)
dilsoz: sadîk, bağh
dilniya: dilxweş, xweşhal
çidarî: hevdîtin
çiqandin: perçiqandin
erênî: pozîtîf, muspet
êsta: niha, nika (şimdi)
gengaz: pêkan, mimkûn
felçe: telaş (parça)
fermî: resmî
femo: kerem bike
fimêsk: hêstîr, rondik
hemwelatî: hemnişîn (yurttaş)
hêman: unsur
kambax: berbad, xerab
karesat: trajedî
karmend: fermanmber, memur
karsaz: karbidest (işadamı)

mebest: niyet, meram
nakokî: tenakûz (çelişkî)
nexwasiim: bi taybetî
nîjadperestî: regezperestî, rasîst
pakrewan: şehîd, cangorî
payebilind: elit
peroşîner: heyecanlandîr
peybandin: çespanî, tasdiqkirin
pergal: sistem, nizam
pişe: mesleg
raborî: rabirdû, (geçmiş)
rêbaz: metod, ekol
rêloxistî: organizebûyî
sazûman: nîzam, sistem
serincakêş: balkêş, seyr
serçave: çavkanî
şayeskirin: taswîrkirin
şerpeze: binkefî, sefil
temen: emr, jî
têgihîştin: fêmkirin
tekûz: bêkêmasî
têgih: têgîn (kavram)
tip: pî, herf
tomarkirin: qeydkirin
tomargeh: stûdyo
vegotin: anlatmak
xwederbinin: xwe ifadekirin
zagon: qanûn, yasa
zivêrbûn: acizbûn, tengazerbûn

Nîqaşên ku li ser demokrasiya Tirkîyeyê pêk tên, ne nû ne. Ji avabûna komarê vir de didomin. Ev nîqaş bûne perçeyekî jiyana gel a rojane. Hebe tune be, ev rastiyeke û di jana civakê de wateya xwe dibîne. Bi çî dirûvî dibe bila bibe, nîqaşên ku tên kirin, piranî bi xwe re hinek nakokîyan jî tînin. Ji ber vê yekê gelek xeletî jî çêdibin.

Rêveberên Tirkîyeyê, demokrasiyê bi qewlê normên rojavayîyan dinixînin û emelê xwe 'hinek kêmasî ne tê de', wekî wan rava didin. Ji wî qasê çer ku birêz Özçelik difikirê, bi rastî jî; "Kes nikare bêje li Tirkîyeyê demokrasi tune." Dibejin em bi sistemeke parlementer, demokratîk û pir-partî tînin rêvebirin û dewleteke hiqûqî heye. Rast e, ev normên demokrasiya rojava, ew demokrasiya ku, tu ji bo wî can didî, te durûtiya xwe di wê de ji nîşan daye. Ez dixwazim hinekî li ser vê durûtiyê rawestim.

Server Tanillî di berhema xwe ya bi navê "Em Demokrasiyê Çawa Dixwazin?" de, vê durûtiyê bi pişkî zelal dike. Şiroveyên demokrasiyê di du xalan de kifş dike û dibêje: "Li Tirkîyeyê mejiyê kedxwarên serwer an jî qafê çîna kedxwaran ji wêjeya marksîst tiştêkî fêma nake." Tiştê ku dizane di vî warî de qedexekirina nîqaşan e. Lê em nikarin bibêjin demokrasiya 'Rojavayî' jî baş nas dike. Ji ber vê yekê, wekî qalîkekî vala ye. Bi kîjan aliyê de bê ajo-

tin, wisa dimeşe. Ji vê rewşê piranî paşverûti û bêhtir ji faşîzm fêde digire.

Bingeha demokrasiya rojava "Plûralîzme" ye. Navgînen plûralîzmê; parlemento, partiyên ramyarî û hîlbijartin in. Durûtiya herî mezin ev e. Te navgînen wê ava kirine, lê ka bingeha wê? Di bingeha plûralîzmê de her raman ji aliyê naveroka xwe ve azad e, bi azadî tê ifadekirin û bi azadî tê sazîkirin.

Li Tirkîyeyê ramanên li dijî bîr û baweriyê fermî tînin çewsandin û dibin tawanê ramîne. Heke tu kurd bî, tu di-

Em nikarin bibêjin Tirkîye demokrasiya 'Rojavayî' jî baş nas dike. Ji ber vê yekê, wekî qalîkekî vala ye. Bi kîjan aliyê de bê ajotin, wisa dimeşe. Ji vê rewşê bi piranî paşverûti û faşîzm fêde digire.

bî 'cudaxwaz'. Bi kurtayî, li Tirkîyeyê demokrasi heta vir e, ji vir şûn de xelas dibe. Ev têgînen ku me rave kirin jî beyhûde bûn. Çi ye bîr û baweriyê fermî ya dewletê? Înkarkirin e, asimilasyon e û nîjadperestî ye. Gişt yek in. Yek civak, yek netewe û wekî robotan tevgerin. Ku tu ji vê xetê derbas bûyî xezeb li serê te ye. Tu çî bixwazî heye; kuştin û zîndan û ji van bêhtir 'işkençe'.

Kesên ku gotine 'ez kurd im', hemû di bin copan de derbas bûne. Ji ber vê qasê me hinek taybetiyên xwe yên xwezayî wînda kirine. Çi ye ev taybe-

tiyên me yên xwezayî û taybetiyên mirovane; 'Tirs'. Ew sosretên ku hatin serê me li me rewşa bûn. Em êdî natirsin. Ma êdî ji tirsê wêdetir çî maye?

Gelê kurd di têkoşîna mirovahiyê de hatiye merhaleyeke balkêş. Pêwîst e ev pêvajoyê, bi hevkarîyê bê xurtkirin û bingeha wekhevî û biratiya gelan bê avêtin. Dawiya dawî alternatîf jî jixweber derdikeve holê. Çima bingeha yekitiyê nayê avêtin? Çima hin polîtîkayên alternatîf nayên afirandin? Hemû şexsiyetên demokrat û saziyên alternatîf nayên afirandin? Hemû şexsiyetên demokrat û saziyên demokratîk, pêwîst e xwe ji ramyariya bêçlaqî biparêzin û jê dûr bixin.

Bîr û baweriyê serwerên zordest diyar e. Bi rêxistinbûna xwe, statûyek jî ava kirine. Lê ev statû, li qelafeta civaka pirçandî nayê. Çi lê tê? Demokrasiyek tevlihev,

demokrasiyêke durû. Ew jî ava bûye. Encam, "kî di binî de ma, bila biperçiqe."

Piranî kedkarên bindest, li hemberî van serwaren, çer ku dema buhranek li wan biqewime, alternatîfa xwe pêk tînin, pêwîst e ew jî ji bo rizgariya xwe alternatîfan biafirînin. Çima li dijî dewleta ûnîter, statûyêke demokratîk ango dewleteke demokratîk nayê avakirin? Ji bo statûyek wiha gelê kurd bikeve ser milê wî, ewê bine cih. Wê demê demokrasi jî wateya xwe dibîne. Dimîne mafê wî yê çarenûsî ku ew jî bi îradeya wî ve girêdayî ye.

Aştî û yekîtiyê kî naxwaze?

Alî Qazî: Helwesta PDK piştî ku hêzên tirk ketin Başûr guherî. Kes nikare bibêje PKK ne rêxistineke başûrî ye. Dibe ku yekîtiya neteweyî bi pêşengiya PKK'ê pêk were. Ji bo ku kurd di Kurdistanê de bi dilşahî û serfirazî bijîn Kongreya Neteweyî pêwîst e.

Ev demek e dirêj e ku, Başûrê Kurdistanê ji ber şerê di navbera hêzên kurd de, dibê sedema baldariyê hêzên ku berjewendiyên wan di herêmê de hene. Li aliyekî welatên wekî Îran, Îraq, Sûriye û Tirkîyeyê ku Kurdistan li hev par kirine, li aliyê din welatên ewrûpî û Amerîka li gorî berjewendiyên xwe dest avêtine mijarê.

Heta îsal bi tenê gerilayên PKK'ê li dijî hêzên tirk şer dikirin, lê îsal hinek hêzên başûrî jî li hemberî dagirkerî û nokeriyê dest birin xwe. Bi vî yekê re yekîtiya neteweyî di nav hêzên kurd de akûltir bû.

PDK xwe ji kurdayetiyê dûr dixê

Her çiqas di vî warî de gavên girîng hatibin avêtin jî, hê jî şerê di nava hêzên kurd de wekî astenga sereke ya li ber yekîtiya neteweyî dimîne. Ji ber vî yekê hinek kes û sazî dest bi xebatên aştiyê kirine. Bo nimûne li Ewropayê bi beşdariya 50 rewşenbîr û siyasatmedarên kurd, "Konseya Neteweyî ya ji bo Aştî û Lihevkerî li Kurdistanê" pêk anîn. Vê konseyê jî PDK û YNK'ê re name şand û wan jî bersiveke erênî dan. Lê, ji nameya PDK'ê xuya dibe ku ew bişik li vî mijarê dinêrin. Li aliyê din PDK bi her awayî xwe dûrî yekîtiya neteweyî dibîne û ji bo pêkhatina aştiya bi YNK'ê re dijmanatiya bi PKK'ê re wekî merc datîne. Li aliyê din rêxistinên bakurî ên mîna PSK, PYSK'ê însiyatîfê aştiyê dane destpêkirin. Bi heman mebestê Serokê Belediyeyê Amedê yê berê û rewşenbîrê kurd Mehdi Zana jî çû Başûr.

Li gorî agahiyên ku di çapemeniyê de derketine, heke YNK vî yekê bipejirîne, wê PDK pê re bikeve diyalogê. Serokê PDK'ê Mesut Barzanî daye xuyakirin ku wekî bersiva nameya ku Talabani di 13'ê berfanbara 1997'an jê re şandibû, ew dikare li Parlamentoya Hewlêrê bi vî re hevdiwaneke pêk bîne.

Di daxuyaniya Nûnerê PDK'ê yê Londonê Franso Herîrî de jî heman helwesta li hemberî PKK'ê xuya dibe. Herîrî li ser pirsên ku me arasteyî wî kirin, da zanîn ku ew bi PKK'ê şer dikin û bi tu awayî ew bi wê re guftûgoyê nakin. Nûnerê PDK'ê îdia kir ku PKK li Başûr gundên wan dişewitîne, zarokên wan dikuje. Ew gotin jî nixandina hin derdoran kurdistanî ku PDK wekî dilê destê artêşa dike bi nav dikin, tîne bîra mirov. Lewre Herîrî gotinên ku mirov her roj ji daxuyaniyên Waliyê Rêveberiya Ne-asayî ya Tirkîyeyê dibihîze, dubare dike.

Her wiha dîtinên Herîrî ên li ser yekîtiya neteweyî jî balkêş in. Lewre li gorî dîtinên wî hêzên kurd her yek di bin ban-

dora welatekî dagirker de ne û ew dewlet jî destûrê nadin yekîtiya neteweyî. Nûnerê PDK'ê dibêje ji bilî PKK'ê kes li ser mijar Kongreya Neteweyî nasekine, heta YNK jî di çapemeniya xwe de bi tu awayî cih nade vî mijarê.

Rayedarên PDK'ê xwe ji Kurdistanbûnê dûr dixin û Iraqbûnê derdixin pêş. Bo nimûne Huseyin Sincariyê ku di hikûmeta PDK'ê de wezîrîyê dike, di gotareke ku ji bo rojnâmeya Turkish Daily News nivîsî de, dixwaze ku Iraq û Tirkîye li hev bînin û kurdan di nava sîstema her du dewletan de bihelînin.

Her çiqas PDK xwe ji doza neteweyî û yekîtiya neteweyî dûr bixe jî, piraniya hêzên kurd, pêwîstiya yekîtiya neteweyî tînin zimên. Wekî mînak nûnerê Partiya Yekîti (Başûrê Biçûk) Abdulbasid Hemo dixwaze ku şerê di navbera PDK-YNK û PKK'ê de biqede, kurd destê xwe bidin hev û yekîtiya neteweyî pêk bînin. Hemo diyar dike ku dewletên dagirker ên wekî Îran, Iraq, Sûriye û Tirkîye bi tu awayî başiya kurdan naxwazin û lewre jî bi destê wan aştî di nava hêzên kurd de pêk nayê.

Tirkîye tu car nabe dostê kurdan

Rewşenbîrê Kurd Dr. Mahmûd Osman jî balê dikişîne ser heman mijarê û dixwaze ku PDK û YNK li Kurdistanê li hev rûnin, hêviya xwe ji hêzên derveyî bibirin. Osman gotina xwe tîne ser tîkiliya PDK û Tirkîyeyê, pişt re jî vî nixandîne dike: "Tirkîye kurdên xwe dikuje, ma wê çawa aştiyekê ji bo kurdan çêbike. Tirkîye hebûna kurdan napejirîne, heke sibe roj karibe PKK ji holê rake, îcar wê berê xwe bide PDK'ê jî." Her wiha ew dixwaze ku PDK bêyî şert û şûrt bi PKK'ê re rûne.

Li aliyê din Nûnerê Hevbendiyê (ku ji çar partiyên kurdên Başûrê Biçûk pêk hatiye) Îbrahîm Xelîl Hemo jî girîngiya aştiyê û yekîtiya di navbera hêzên kurd de tîne zimên. Hemo piştewaniya xwe ji bo însiyatîfa aştiyê diyar dike û dide zanîn ku aştiyê daxwaza gelê kurd e. Her wekî siyasatmedarên din, Hemo jî dibêje ku aştiya kurdan divê bi destê kurdan pêk were, ne li Şam, Baxda, Tahran û Enqer-



reyê. Nûnerê Hevbendiyê Hemo dixwaze ku yekîtiya neteweyî berfirehtir bê saz kirin, ew dibêje: "Heke rêxistinek jî li derveyî Kongreya Neteweyî bimîne, yekîtiyê kêmkirî dimîne." Hemo jî bo pêk hatina Kongreya neteweyî bêhêvîyê PKK'îyan pêwîst dibîne.

Bêyî PKK'ê aştî pêk nayê

Li ser vî mijarê nixandina herî balkêş kurê Serokê Komara Kurdistanê Qazî Mihemed, Alî Qazî kir. Qazî dide zanîn ku ew ji bo aştiyê çûne serdana Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan. Öcalan helwesteke erênî nişan daye, li ser vî yekê çûne bi Serokê PDK'ê re hevdiwaneke pêk anîn. Wî jî helwesteke nerm nişan daye. Li gorî daxuyandina Qazî berî ku xebatên wan bigihêjin encamê, hêzên tirk ketine Başûr û helwesta PDK'ê jî bi vî yekê re guheriyê. Qazî dibêje: "Êdî kes nikare bibêje PKK ne hêzeke başûrî ye û bêyî PKK'ê li Başûr aştî pêk nayê." Di warê yekîtiya neteweyî de jî Alî Qazî wiha got: "Dibe ku PKK pêşengiya yekîtiya neteweyî bike." Di dawiyê axaftina xwe da wî tevkujîya Helebçeyê bi bîr xist, bi vî yekê jî da zanîn ku hêzên dagirker naxwazin kurd bi bin yek. Pişt re jî wiha dawî li gotina xwe anî: "Em dixwazin Kurdistanê çêbikin da ku kurd bikaribin tê de bi dilşahî û serfirazî bijîn."

Wekî encam mirov dikare bibêje ku piraniya kurdan aştî û yekîtiyê dixwazin, lewre li pey hev însiyatîfên aştiyê derdikevin holê. Gelê kurd yekîtiya neteweyî li ser siyasatmedaran dike ferz, hêzên ku li dijî daxwaza gelê tevbigerin, wê sedema hebûna xwe ji holê rakin.

AZAD ALTUN

Kurtenûçe

Komara Afrîkaya Başûr, bi mebesta ku dewleta tirk mafên mirovan îhlal dike û di warê çareseriyê kêşeya kurd de gavên erênî navêje, biryar girt ku çekan ne-feroşe Tirkîyeyê. Li dijî vî rûdanê, ji Wezaretê Karên Derve ya Tirkîyeyê di bin serokatiya Musteşarê Wezaretê Murat Songar de heyetek, ji bo ku wan jî vî birayerê vegeerînin, roja 20'ê rêbendanê çû bajarê Proterîyê. Hate ragihandin ku armanca heyetê ew e ku, bi riya hevdiwaneke rayedarên Afrîkaya Başûr bixwazin ku bibêjin "PKK terorîst e."

Seroka NÇM'ê Nuray Şen, bi nameyekê serî li balyozxaneyên Amerîka û dewletên Ewropayê û rêxistinên mafên mirovan da û xwest ku ew li dijî kiriyarên dewleta tirk bédeng nemînin. Şen di nameya xwe de, da zanîn ku di bingeha hemû pest û çewsandinên li ser çand û zimanê kurdî de politîkayên dewleta tirk hene. Seroka NÇM'ê di nameyê de bal kişandiyê ser siyasîbûna kêşeya kurd û wiha nivîsiye: "Pirsgirêka gelê kurd siyasî ye û divê bê çareserîkirin. Çewsandinên li ser çand, ziman û dîroka kurdî em wekî êrîşên li ser nîrxên însanî binav dikin."

Hunermanda sinemayê Mijde Ar ragihand ku, ew hewl didin xwe ku filmê "Ağır Roman" ku di demeke kurt de ji hêla 500 hezar kesî ve hatiye temaşekirin, ji bo temaşekarên li Kurdistanê bi jêrnivîsa (altyazî) kurdî bidin nişan dan. Mijde Ar li ser vî projeyê got ku Tirkîye welateke pir çand û pir reng e, lewre wan biryareke bi vî rengî girtine. Ji filmçêkerên "Ağır Roman"ê Sebahattin Çetîn jî da zanîn ku wê ew galaya filmê bi jêrnivîsa kurdî, bi beşdariya hemû listikvanan li "Dilan Sineması"ya Amedê di rojên pêşiya me de pêk bînin.

Roja 20'ê rêbendanê li Ceyhana Edeneyê faşîstan êrîş birin ser maleke xwendekarên kurd û agir bera dolab û tiştên wan dan. Li hêla din li Fakulteya Pîşeyî û Fakulteya Perwerdehiyê ya Giresunê jî xwendekarên welatparêz û demokrat bûn hedefa êrîşên faşîstan. Di encama êrîşê de 2 xwendekar bi awayekî xedar û gelek xwendekar jî bi sivikî birîndar bûne. Li dijî van êrîşên faşîzan HADEP'a Ceyhanê û ÖDP'ya Giresunê ev bûyer bi daxuyaniyekê şermezar kirin.

Rojnamevan û nivîskarê asûrî Jan Bet-Şawoce:

Asûrî xwediye çandêke qedim in

GABAR ÇIYAN


Di rastiya xwe de sûryaniya nû ya rojava ku li Torê pê tê qisekirin, pir dewlemend e. Gava mirov bi zimanekî nexwîne û nenivîsîne, ew ziman çiqasî dewlemend be jî, wê ji hêza xwe bikeve. Ev 20 sal in ku em li Ewrûpayê ne. Heya niha bi tevahî 10 pirtûk bi wî zimanî nehatine nivîsin. Bi vê çûne ew ziman çawa dikare bi pêş bikeve? Gava nivîskarên me bi zimanê xwe li ser felsefe, edebiyat, dîrokê nenivîsîn, mirov nikare qala pêşketina zimên bike.

Jan Bet-Şawocê: Di sala 1955'an de, li Midyadê hatiye dinyayê. Heta lîseyê li wir dixwîne. 1975'an de derdikeve derveyî welêt. Di sala 1987'an de kovara lêkolînî 'Nsibin' di bin berpirsiya wî de dest bi weşana xwe dike. Di wê salê de "Weşanxaneya Nsibin" ava dike. Heta niha 40 pirtûkên weşanxaneyê li ser dîrok, ziman, çand û toreya asûriyan bi tirkî, erebî û kurdî derketine. Jan gelek pirtûk nivîsandine û ew endamê Yekîtiya Nivîskarên Swêdê û Yekîtiya Rojnamevanên Kurdistanê ye.

■ **Zimanê asûriyan zimanekî kevn e. Kovara we ne tîpên kevn, lê yên latînî bi kar tîne. Ev jî dibê sedem ku zimanê kovarê bête rexnekirin. Çima ne tîpên kevn, lê tîpên latînî hatin hîlbijartin?**

Rast e. Em xwediye zimanekî dewlemend in. Zimanê me bi navê kildanî asûrî, sûryanî tê nasîn. Ew bi sê cure alfabe-yan tê nivîsîn; kildanî, estrangelo û sûryanî (sêrto). Alfabe-ya kildanî ji 22 tîpan pêk tê û ji aliyê Dêra Kildanî û ya Nastûriyan ve tê bikaranîn. Tîpên dengdar ji jêr û jora xwe ve tîpên noqtekirin û bi vî şeweyî dangan distînin. "Şedde" ya erebî, ji bo hişkkirina tîpan bi kar tê. Alfabe-ya sûryanî li dêra sûryaniyên rojava tê bikaranîn. Yanî sûryaniyên ortodoks, marûnî, sûryaniyên katolik û li hin deveran jî rom-ortodoks û katolik pê dinivîsin. Tîpên grekî yên dengdar li ser jêr û jora tîpên wê yên dengdar tîpên siwarkirin û bi vî şiklî dangan distînin. Di vê alfabe-ya de tîp nayên hişk-kirin. Tîpên bi quncik estrangeloyo ji aliyê tevahiya asûriyan ve tîpên bikaranîn. Sernivîs û nivîsên taybetî, bi wan estrangeloyo tîpên neqîşandin. Kesê ku bi zimanê me bizanibe bi hêsanî dikare wan tîpan bixwîne. Ji bilî wan zimanê gersûnî jî heye. Berhemên bi vî zimanî tîpên wan asûrî ne, lê ziman tirkî, kurdî, farisî û erebî ye.

Wekî tê zanîn, cih û warekî fermî ye gelê me tune. Mîna Watikanê dêrên me yên hemdem, federasyon û komele yan jî komîteyên ku em pê ve girêdayî ne, tune. Lewma ye ku wekî gelek pirsên me, pirsgerêka zimên jî yek ji wan probleman e, ku li benda çareserkirinê ye. Dem derbas dibû û ji awira zimên ve rewşa me xerabtir dibû. Min jî dest avêt tîpên latînî. Sedema wê ev e: Sûryaniya klasîk a rojava an ku zimanê Rihayê, piştî Mesîh bû zimanê nivîsînê. Di pêşveçûna ola filehî de, ew ziman hat bikaranîn û pişt re mîna zimanê nivîskî jî hate hejmartin. Di dema



niha de ew ziman bi tenê ji aliyê hinek oldarên me û rojhilatnasan ve tê zanîn. Li dêra, di dema nimêj û hwd. de pirtûkên olî pê tîpên xwendin. Ji bo ku xelkê tîpê bigihêje, tîpên tîpên xwendin ji aliyê oldaran ve bo zimanê peyvandinê tîpên wergerandin. Ev nakokî bû û ew nakokî cara yekemîn di salên 1960'î de ji tîpên zimanzanê almanî Prof. Helmût Ritter ve hate dîtin. Ritter pîrî caran diçû dêran û li oldar û xutbên olî guhdarî dikir. Wî gotibû: Li dêrên sûryaniyan du zimanên ciyawaz tîpên bikaranîn.

Li ser bikaranîna tîpên latînî gelek kessan ez rexne kirim. Li gorî wan, ne pêwîst e ku mirov tîpên latînî bi kar bîne. Ji ber ku alfabe-ya me dewlemend e. Lê çend gotinên min ji wan kessan re hene: Gava hûn karibin li ser tîpên kevn xelkê îkna bikin û di dîw xwe de bikşînin, fermo. Lê bi rastî tu kesî ev kar neda ber xwe. Kesên ku kar dikin pir kêmtir in. Jixwe gava qala mesrefê tê kirin, her kesek bi aliyekî ve diçe. Baz didin. Federasyon, komele û dêrên me, li hemberî tîpên latînî ne. Lê tişteki alternatîf jî çênakin ku zimanê me hêsan bike û bi awayî pê bê xwendin û nivîsîn û gelê karibe li zimanê xwe vegere. Ez pîrî caran diçim dêr û federasyonên me. Li dêran, zarok stranên olî distîrên. Ji bo ku stran di bîra zarokan de bimîne û wan ji bîr nekin, zarok, stranên bi alfabe-ya zimanên ewrûpî dinivîsin, not digirin. Wisan jî dixwînin. Federasyon û komeleyên me, di danûstandinên xwe de nameyên xwe bi zimanê xwe nanivîsin. Protokolên kongre û civînan, bi zimanê wan welatên ku lê ne dinivîsin. Di peyvên xwe de dibêjin: Em ji bo gelê xwe kar dikin. Heta duh bi çavekî nîz li zimanê xwe temaşê dikirin. Ji ber ku min alternatîfêk baş anî,

gazinan dikin. Lê niha van gazinan şûna xwe dane xwendina tîpên latînî. Ev jî pêşveçûneke baş e.

Çanda devkî ya gelê me; çîrok, stran, gotinên pêşyan û hwd. ku dewlemendbûna gelê me li Tora Evdînê ye, tev bi wî zimanî ye. Çanda me ber bi windabûnê ve diçe, lê ew bala me nakîşîne. Gelê me bi tevayî nikare bi alfabe-ya kevn bixwîne û pê binivîsîne. Li welêt ew çand û adet ji nîfşekî derbasî nîfşê din dibû. Lê li derveyî nîfşên nû ji çand, adet, ziman, dîrok, cih û gelê xwe her ku diçe bi dîr dikevin. Pişafîneke ecêp û kesnedîtî her roj tê pêşiya me. Ev di dema niha de ne malkambaxî be, ma çi ye?

Di rastiya xwe de sûryaniya nû ya rojava ku li Torê pê tê qisekirin, pir dewlemend e. Gava mirov bi zimanekî nexwîne û nenivîsîne, ew ziman çiqasî dewlemend be jî, wê ji hêza xwe bikeve. Ev 20 sal in ku em li Ewrûpayê ne. Heya niha bi tevahî 10 pirtûk bi wî zimanî nehatine nivîsin. Bi vê çûne ew ziman çawa dikare bi pêş bikeve? Gava nivîskarên me bi zimanê xwe li ser felsefe, edebiyat, dîrokê nenivîsîn, mirov nikare qala pêşketina zimên bike. Li Ewrûpayê em dikarin li her cihî dibistanên zarokên me ku li welatên cur bi cur mezin dibin, bi zimanê dayika xwe nikarin bi hev re bidin û bistînin. Li hemberî vê qewimînê, kes û dezgehên me bêdeng in. Ez rewşenbîrekî ji vî gelî me. Min helwesta xwe bi vî şeweyî nîşan da.


■ **Gelek kes rewşa asûriyan ya îro meraq dikin. Li Mezopotamyayê hejmarra asûriyan çiqas e? Hejmara asûriyên li derveyî welêt pir e?**

Welatê asûriyan xwedî gelek navên cîyawaz e; ew nav ev in: Mezopotamya, Aşurîstan, Aramîstan, Kildanîstan, Sûryanîstan û Babilîstan. Asûrî ji Basrayê heta Kafkasyayê belav bûbûn. Berî Mesîh û piştî wî gelek kes hatin qetilkirin û ji ber vê yekê hejmara asûriyan pir kêmtir bû. Li Tirkîyeyê hejmara wan îro ji 20 hezarî derbas nabe. Li Sûriyeyê jî 500 hezar in. Li Iraqê bi qasî milyonê, li Îranê 60-70 hezar, li Lubnan, Misir û Urdûnê jî hejmarek baş hene. Berî şerê yekemîn ê cihanê, ji Edenê gelek sûryani derbasî Grekê bûn. Ew li Argosê li du-sê gundan dijîn. Li wir mîna qereçan dihatin nasîn û di bin tadeya niştcihên wir de bûn. Li Kafkasyayê hejmareke baş asûrî hebûn. Li Azerbeycanê piştî dijîtiya etnikî, hejmara asûriyan kêmtir bû. Li Rûsya û welatên Asyaya Navîn jî gelek asûrî hene. Lê hejmara wan ne diyar e. Gelek kes jî asûriyan, berî û piştî şerê cihanî li Amerîkaya Bakur û Amerîkaya Latîn bi cih bûn. Wan ziman û çanda xwe jî bîr kirine. Li Amerîkayê 500 hezar, li Amerîkaya Latîn jî 100 hezar asûrî hene. 10 hezar kes jî li Kanadayê dijîn. Ew çî demî çûne wir em nizanin. Li Awustralyayê jî 20 hezar kes hene.

Gelê me yê li Ewropayê pêşî li Îngîlistan û Fransayê bi cih bû. Wan her du welatan li Rojhilata Navîn gelek welat dagir kiribûn. Ji sûryaniyên rojava û rojhilat gelek kes bûbûn leşkerê wan yê kirêkirî. Piştî ku karê wan bi dawî hat, gelek jî wan kesan li wan welatên Ewropayê bi cih bûn. Karkerên asûrî di destpêka 1960'î de hatin Almanyayê. Heta serê 1970'yî hatina karkeran ber-

dewam kir. Piştî re gelek kes li welatên skandinawî û cihên din, bûn penaberên politîk û li wan deveran bi cih bûn. Îro 200 hezar asûrî li Ewropayê hene.

■ **Ez dixwazim tu bi çavekî rexneyî nêzî vê pirsê bibî. Pirsgirêkên asûriyan yê li derveyî welêt çi ne? Ji**



Dêra Zehferan a li Mêrdînê

bo çareserkirina van, çi kar û xebat hene? Ew çi qas dikarin bi ser bikevin?

Di serî de bêrêxistîni, bêserokatî, asimilasyon, bêarmancî, nezani, bêhisî, bêexlaqî, bêfelsefeyî, durûfî, du-zîmantî, nederûstî tê. Ji Rojhilata Navîn li

gelek pirsgirêkan xwe em hatine vir. Mîrasa me ya têkoşîna politîkî zêde tune bû. Mêjiyê feodalî pir bi hêz e, her ku diçe ber bi windabûnê ve naçe, lê xurtir dibe. Dêrên me nikarin reforman çêbikin, di xebatên xwe de li paş dimînin û roj bi roj endamên wan kêmtir dibin. Mirovên me diçin dibin endamên

dêrên ewrûpiyan. Dêrên me bi milyonan pereyan mesref dikin û dêrên nû ava dikin, lê kêmtir kes diçine wan dêran. Rêveberên li dêran, ji hêza muxtarekî gundan bihêztir in. Exleq, adet, mirovanti, felsefe, aşîhezi û mêvanheziya xwe jibîr kirine. Kesên ku eleqata wan ji nêz ve bi karê ruhanî re tune ye, dikin

keşe. Bi vê jî adet û toreyên li dêran, ber bi xirabiyê ve dibin. Mîsal; pêşî hevdûberdana di navbera jin û mêrande, ne hêsan bû. Lê niha pir hêsan kirine. Berî niha kesên nexwende, dirû duziman û hê hûrmet nikarîbû karên olî li dêran bikira. Niha li gelek deveran mirov rastî kesên wisan dibe. Û wekî her car ku ez di kovara Nisibîn de qal dikim; Dêrên me li ber kîjan deverê ve diçin? Ji bilî vê, di navbera dêrên me de danûstandin pir kêmtir in. Ji jor ve, ji teref petrik tîndarekirin. Ji bo başkirina eleqatên di navbera dêran de, danûstandin pir kêmtir in. Federasyon û komeleyên me, mîna dêrên me ne. Ji doza netewî, demokrasi, û dîtînen hemdemî pir dîr tîdikoşin. Mirov dikare wan ne bi navê dezgeh, lê bi navê çayxaneyan binav bike. Li wan çayxaneyan di (2) karên esasî tîndarekirin: Pêşxistina listikên qeremaçan (kaxez) û di bin navê listika futbolê de xirecîrek bêwate û bêarmanc... Car carna jî li ser navê welatêzî! şev tîndarekirin, dîlan tîndarekirin û eraq tîndarekirin...


■ **Gelek pirsgirêkên me yê wisan hene, lê tu kesên me ku li ser van pirsan lêkolînan bikin, tune ne. Kes lê napirse, ka çima em ketine vê rewşê? Riya felatê çi ye?**

Wekî ku tu jî zanî, di van rojan de salvegera jenosîda ermenîyan ya 1915'an jî heye. Bi qasî ku ez zanim, asûrî gelek caran dîrokzanan rexne dikin ku qirkirinên asûriyan naynin zimên.

(Wê bidome)

Ezan bi tirkî, Quran bi tirkî, tirk û musilmantî

AHMET BARAÇKILIÇ



Di dîroka îslamîtiyê de, tîkiliya tirkan û musilmantiyê bi serê xwe mijareke taybet û balkêş e. Ev mijar ji aliyê gelek lêkolîner û şîrovegerên dîroknas ve hatiye şîrovekirin û tesfîrkirin. Bêguman her lêkolîner û dîroknas li gor bîr û bawerîya xwe mijarê dinirxîne, şîrove dike û dinase. Li ser vê mijarê nêrînen çewt, di nav nivîskarên tirk de, bi awayekî balkêş û berbiçav xuya dibin.

Tirk di salên 1171 de, bi darê zorê û qirkirinan ji Moxolîstanê ber bi Anatoliyê ve hatin û bi cih bûn. Musilmantî berî hatina wan 700 salan derketibû holê, belav bûbû û bi taybetî jî ji aliyê gelên Rojhilata Navîn ve hatibû pejirandin. Tirkan bêdijberî û bêniixandin ji bo berjewendiyên xwe musilmantî pejirandin. Ji wê demê pê de tirkan bi navê musilmantiyê gelek daxwazên xwe bi cih anîn, bûn netew, bûn dewlet, bûn împarator. Ji Kafkasya ta Wiyana, ji Afrîka ta Balkanan gelek welat kirin mêtîngeha xwe. Di van êrîşên mêtîngehkirinê de, bi sed hezaran xîrîstyan û mesîh kuştin. Bi sed hezaran musilman jî qetilkirin, kuştin û dewlemendiya wan jî talankirin, Bi kurtayî tirkan her dem

musilmantî jî bo berjewendiyên xwe bi kar anîne. Mixabin di vî warî de jî gihîştine gelek armancên xwe.

Çawa dema ku ji Moxolîstanê hatin bêqeyd û bêşert, ji bo menfaaten xwe bûn musilman, daxwazên xwe bi cih anîn û gihîştin mebesta xwe. Îro jî ji bo ku di nav Yekîtiya Ewropa de cih bigirin û dijê Ewropahiyan xweş bikin, bi diwarî êrîşî nixên musilmantiyê dikin.

Bi bawerîya min dewleta tirkan tu carî nixên musilmantiyê neparastîye. Wê demê çawa bûn musilman îro jî bi wan taktîkan dixwazin tevî Yekîtiya Ewropa bibin. Lê bi rastî çendî ku ji musilmantiyê dîr in ewqasî jî ji Ewropayê dîr in. Bi gotînan ji Ewropayîyan zehfîr demokrat in, ji hemû musulmanan jî zehfîr misulman in. Bi lixwekirin û vexwarina xwe, bi stran û dansên xwe û her wiha di gelek waran de Ewropayîyan teqlît dikin. Lê bi qanûn û nizamên xwe û di warê mafên mirovan de gelekî dîrî çanda Ewropî ne û çendî ve dîrbûniyê jî nijadperest in. Ev nijadperestî û faşîzaniya wan jî her demê zehfîr û bi eşkeratî berdewam dike.

Dewleta tirk jî bo daxwazên xwe yê emperyalist li dijî gelê kurd û ereb bi Îsraîlê re hevkarîyê dike û dixwaze bibe endamê Yekîtiya Ewropayê.

Piştî ku dewleta tirk tîkiliyên xwe bi Îsraîlê re xurtînin 'di îslamîtiyê de reform' anîn rojevê. Bi taybetî di van rojan de televîzyon û çapemeniya wan, bi giranî li ser van mijaran radiweste. Di van mijaran de ya herî balkêş 16.01.1998 de, di televîzyona tirkan Atv de, bi zindî şeş saetan hate guftûgo kirin.

Yên di programê de cih girtibûn; Prof,

siyasetmedar, nivîskar û rojnamevanên dîndar û oldar bûn. Di programê de tiştên ku hatin niqêşkirin bi rastî balkêş bûn û çendî balkêşiyê jî genî bûn. Bêguman tiştên ku hatin gotin mixabin ez nikarim di vir de binivîsînim, ezê tenê çend gotînen beşdarî beşîrove binivîsînim.

Şîrovekirin û nixandinê jî ji xwendevanan re dihêlim.

"Kesên ku îlahiyet xwendine û îbadetê bi erebî dikin papaxanên ereban in. Ezan, ayet û Quran; divê bi zimanê tirkî bêne nivîsandin û xwendin. Divê ji Adrîyatîk ta Benda Çînê hemû musilman, bi taybetî yê ku ji nijada tirkan in îbadeta xwe bi tirkî bikin, çanda ereb ya kevnar berdînin, çanda tirkan ya geşbûyî hilgirin. Zîhniyeta ereba ya genî berdînin, di dibistanan de, medrese û camîyan de divê erebî rabe. Erebi dixwazin bi ola musilmantiyê kultura xwe li ser me ferz bikin, ev jî faşîzantî ye. Divê li Tirkîyê sazî û avahiyên olî tunebin. Ola îslamî jî bo vê dinyayê nîn e, em li vê dinyayê dijîn. Ol dogmatîk e, civatê pêşnaxîne. Divê ol marjînal bibe."

Li Tirkîyê bi erebî perwerdehî pêk hat, ezan, îbadet bi erebî hate kirin. Lê îro pê de divê zarokên me, neviyên tirkan bawerî û îbadetên xwe bi erebî nekin, tirkên Balkan û Kafkasyayê bi erebî nizanin. Ev dezavantajek e, divê ew bi zimanê tirkî perwerde bibin. Ji bo wê perwerdebûnê jî Fetullah Gülen bi her awayî alîkariya dewletê distîne û vê mebesta nijadî û faşîzantî pêş dixê.

Ev gotin yê rêber û rênişandarên musilmantî tirk in. Li Tirkîyê bi salan e bi pirtûkên wan, bi dersên wan û bi rêberîya wan îslamîyê hatiye nasîn. Divê em jî û hemû alema îslamî jî wan binasin.

Hirê şehîdên ma: Hişyar, Xetîp û Cîhat

Payizê 1977 de Xatîpî Amed de, Hişyarî jî Enqere de dest pê wendinê zankey (universîtey) kerd. Xatîp xeletiyê yew nêzanayinê ma ra bi mahkûm û wendena xo ca verda. Çend finî tepîşiya, viradiya. Sera 1992 de bi doxtor, semedê lecê kurdan Vaşûr û Vakûr zehf qehriya û teterxûn bi. Rojê 15'ê adara 1993'in de şî rahmê Homay. Gorê (mezêlê) ey dewa ci Kargapazarî de no. Sabir û nepenî ey qet çewtîn çinêbî. Lacê ey Şevder û kêna ey Arda esta.

Hişyarî jî zankeyê ODTÜ de fakûlteya ekonomî de wend. Sera 1989 de weçinê belediye de bi navzeto xoser. Zey vatena Şêx Melik Fıratî 'nesilo gemar' neverda ke o bibo serokê belediyeya Dara Hênî.

Wextê ke embazê ma wo şampiyon İbrahim Incedursun Norwec ra ame, bacarê Çewlig de HEP saz kerd (nê ro). Hişyar jî kewt şaxê HEP'a şaristan, cê navçe (qeza) yê Darê Hênî ji kiştê bûroyê ey de niya ro. Badê qefelnayin HEP tade yê dormalê Darê Hênî da zêdî ya. Hişyar pa biraran û embazan xo her hal, geh tepîşiyayê geh veradiyayê. Dîşmenî senî kerd nêşa Hişyarî welatê ci ra dûrî fîno. Tade yê co ra tepiya, roj bi roj zêdiya.

Nika rayê Dara Hênî û Lice qefelnaya wo, bê destûr kes nêşkeno 5 kîloy ardî, şekir, riwen yan jî, di citê solan (nemnî) biyero bero key xo. Asmînê Dara Hênî ra helikopterê kemî nêbenê. Bombeyanê xo her roc erzenê û şinê. Daristan (mêşe) nêverda, veyşna, yan jî birna, hazhaz kot her cayê ma.

Dewleta merdimanê, ma tim û tim keyfî gena binçim, îşkence pê kena û ek ard firsend, kişena. La belê huncî ji nêşikên gerîla vindarnê. Geliyê Riz biyo qîrş, qirikê înan de mendo.

Senî ke Hişyar qerar xo da ke navçeyê Dara Hênî de HADEP ro no, çete na ray dest est yew psikopat kerd aduyê ey. Hişyar zê namê xo ebi rastî jî hayik bi. La belê çî heyf o ke na rê dum (kemîn) nêdî, pê nêhasiya. Hama her çî zelal nebiyo, la çete planê xo virast, na serweş kerd aduyê ey. Şewa bêbext de, bêveng bêsof faşist û kutikanê Dara Hênî, embazê ma, ma dest ra girot. Rojê 26'ê berfanbara 1997 şehîdê ma, nezdiyê çahar hezar kesana Goristanê Kupar de tepirya (defin bi).

Na nimûneyan ra fam bena ke, dewlet her tim polis û cendermanê xo wa têna, nêşkena ma bikşo. Dewleta, ca ca lep erzana kutikanê ma ver, xîntanê ma xapîna, ebi destê înanê Hişyarî ma, ma dest ra gena. Rê rê gêjanê ma kena faşist û pa Cihatanê ma kişena, rê rê nahşiyane ma xapîna û fit kena verdena ma wa, Şakirê ma, ma paşt ra gena.

Şakir verî DDKO'yê Stenbolî de xebityabi, na semeda 1971 de kewt bi Zîndanê Amedê. Wexto ke şehîd kewt DDKO de xebityayê, la belê her kesî ey ra hez kerdê. Partîzan nêbi, welatperwero bêqatix bi. Çetey warzeyê Hikmet Tekinî vist Şakir pey û o kişt. Ey winî zanayê ke qesasê xalê xo giroto. La belê nêzana ke dewlet o xapit, fit kerd o verda ma ser.



Ji aliyê çepê ve, Cîhat, Xatîp, Hişyar

Hişyar, wexto ke taziye (ser saxî) ya to ra gera wa, ez ewna wa na fotograf şima ya dîrokî. Xeyalê xortîna şima ame mi vîrî. Çimanê mi hesir kerdî, dîroka Çewlig a welathezî xo sinasnayinî, sarewedayişî, zê şeritê film çiman mij vera rahsika û viyart. Na fîlm de, çî ko mi di ez nûsena ke, wa herkes pê bizano.

Na fotograf hirê xortan û egîtanê ma wo û sera 1976 de veywê waya Hişyarî de anciya wo. Ez fikiriyawa Cihat Elçî Çewligic, Xatîp Demiralp Kaniya Reşic, Hişyar Dara Hênîyic, Xatîp kurmanco ê bîni jî dimilî yê.

O çax (1974-1975) Hişyar Sekreterê Komelê Çand û Paştigirota Xortanê Bîngol bi. Serokê CHP'ya Çewlig Hikmet Yurtseverî û serokê şaristan Sait Aymaz, komel gereyê waliyê Çewlig kerd bi û nê gerey ser, polisî komel de, ta gêra, yew belavok û pirtûkê Apê Musa Birîna Reş dî (dît). Coka komel qefelna (racena). Belavok nûştayê kovarê faşistan Ötügen lanet kerd bi. Rêza bînin de dirûşmeya "Bijî têkoşîna xelasnayina neteweyî û şarê kurd" nuşte bi. Hişyarî vat belavok mi nûsto, elaqê komel pê çiniyo, na dawa ra Zîndanê Elmadağ de serê (1978-1979) mend. Qandê komelê xo, xo feda kerd.

Şoresgero pil M. Xayrî Durmuş na komel da semînerê xo yo verîn, dîrok û civatê ser da bi. Dêse komelî de tablo yê gerîlayê Vietnam aleqnayê bi. Bin resim de jî "Ey üstekiler biz bu kamışlardan çoğuz, kırılmakla bitmeyiz (Ey jorînên ma na qamişan ra vêşî mi, ma şikîtinê nêqediye mi)" nûsiya bi. Ez bawer kena ke Xayrî dema ke vera hakimî sere wedart, qîrîn vatên 'Kurdistan biyo Vietnam' na resim jî amên çimandê ey ver.

Zekî Yıldız îta (ewta) de zîwanê xo ya

wendin û nûstin musiya bi. Pêniyê 1981 da dewê Xayrî Omik de şehîd kewt, la belê gerîla wo çewligic Mustafa Ayçiçek deyir est ey ser û vat: 'Bingol şewitî mij dûman o' Nika jî her cê Kurdistan de, wextê def niya ro na deyir vajêna, xort û kênê ma na deyir ra govend tepîşenê.

Abdullah Ekinci na komel de xo şinasna û dema ke Mahsum Korkmaz ramit Dihê sero, ey jî embazanê xo ya girot ser Şemzînan.

Cihat, dezayê ey parêzgero zana Şakir Elçî şehîdê ma wo bîni İdris Ekinci pê kiştî di defin bi. Berkole înan de şehîdê Kurdistan nusîbi. Çete şevêk berkole yîn jî şikî. İdrîs peniyê 1977 de dema serokatîya Hikmet Tekin da, zerê avahiyê belediya de dest yew kemaqîl ra pê gulê damençê kişiya.

Çewlig de Yadin Paşa (Yad Mahmut Abas) ra tepiya, vera dîşmen giştî verîn Hişyar ant, Xatîp jî wîja bi. Yadin Paşa û cinê xo Têllî yê Xellûn heta ke şehîd kewt, vera çeteyan şer kerd, dewlet serê ey biran berd, kes nêzano tim ey kam ca da wo. Ca wo ke xo çeteyan ra starên (sixinak), şarê ma û çîr (henî) a ke kaş na stargeh da wa, namê ayê Çirê Yadê na pa. Awê na çîr zehf weş a, amnanan da kam ke o rayar ra bivero, arebe vînarên û temaşê ayê keşan kenî. Çete nêwazeno ku şarê ma dîrok xo bizano, wayêr dîroka xo biveviyo, na name bedelna kerd 'Ata parki'. La bê karmendan kes nêvano Ata parki, her kes vano Çirê Yadê ma, Tom ey o pil Cezayir, Erzirom da doçento welathez Orhan Yavuz kişt (1997). Hama jî remayo wo. O qic ji namê pirik xo wa wasfîyon, resim Yadin Paşa des aşxanê xo da aleq-neno û heta bîna jî nêzantiyê keno, rêçê Türkes dima şino. Qê nê person, çeteyan

sarê baw û kalê mi çî ra birna berd, tîrm baw û kalê mi û gora Telliye Xellûn kam ca da wo?

Hişyar ebi no karê xo tersê xortanê Çewlig înan şikî. Serokê MHP'yê Çewlig, şaristan ra rema tever. Serokê koma xortanê welatperwer yê şaristan, amnanê 1979 de xeber geno ku Hikmet Tekin şiyê Dara Hênî, leza bez planeke weş virazeno. Embazanê ci Dara Hênî rayê Çewlig û Dara Hênî ser de çeteyê dewlet kişt bi. Na ra tepiya faşist Çewlig vila bi.

Hişyar û Xatîp tersê Çewligîyan şikî, Zekî Çewlig faşistan ra kerd pak. Şah Hûsên birayê Xayrî rayer gerîla kerd a, zimistanê 1981 de koyê Kaniya Reş de bi şehîdê Çewlig o verîn. Xayrî zîndanê Amed de bi efsane qûrfê neyar kurdan şikî. Pêniyê emira xo de vat: "Şarê kurd wa mi efû bikero, emir mi bes nêbi ku ma Kurdistanê azad saz bikir." Rojê merg giroto. O zalimê Zîndanê Amed, Esat Oktay Yildiran ard çokan ser. Tersê tepîşayan şikî. Sarewedayin zîndanê pey ey dest pê bi. Nika o ji goristanê Çewlig da, kiştî birayê xo de rakewto. M. Hayri Durmuş ebi xo nêzewiciya, xo qicer birayê xo Şah Hûsên zewecna, namê lacê ey ji Şah Hûsên o.

Hikmet Yurtseverî yew het ra gereyê ma kerdê, heto bîni ra xo şetan welatperweran pêş, vatê: "Mi faşistan ra bipawiyen." Embazên ma, şehîdên ma, çimî şima wa tepiya de nêmano, nizdî ra ma welatê xo bin payan ra raxelasinê û ma hemiyana yena gorê şima û şehîdên ma yên bînan sera, marşê ma wa Ey Rapib awnena. Berkole yên Cihat, İdrîs û Şakir ji virazên û cayê ci de nanê ro.

□ Mustafa Suphi û hevalên wî hatin xeniqandin

28 rêbendanê di 1921:

Serokê Partiya Komünist a Tirkîyê (TKP) Mustafa Suphi tevî 15 hevalên xwe di Behra Reş (Karadeniz) de ji hêla kemalîstan ve bi awayekî hovane û xayînî hatin xeniqandin. Mustafa Suphi û hevalên wî ji bo ku beşdarî Şerê Rizgarî ya Tirkîyê bibin dihatin Enqereyê. Lê kemalîstan nedixwest bandora komünîstan di nava şer de zêde xurt bibe. Her wiha kemalîstan, Partiya Komünist a Tirkîyê di navbera xwe û Yekîtiya Sovyetê de wekî kelem didîtin.

BÛYERINE JI DÎROKÊ



□ Îmam Elî hate kuştin:

24-29 rêbendan 661:

Di sala 657 (P.Î) an de, di navbera Muaviye û Îmam Elî de şerekî tund û dijwar ji bo xelîfetiye derket. Li dijî wê yekê gelê Sûriyê hakem xwest. Hakem hatin peydakirin û ji bo ku biryareke çareseriyê bigirin li hev rûniştin. Di dawiyê de hakeman biryar girt ku Muaviye xelîfe ye. Lê îmam Elî dev ji xalîfetiye berneda. Piştî ku ew li Kufayê di sala 661'an de hate kuştin, xalîfetiye ji kete destê Muaviye.

Nivîskar Mehmet Uzun:

“Rewşa civakê bandorê li nivîskar jî dike”

Heke heya îro zimanê kurdî li ber xwe neda kurdan jî nikaribû li ber xwe bida. Uzun bi taybetî bal kişand ser girîngiya têkoşîna çand û hunerî û diyar kir ku bêtî têkoşîna çandî bi ser ketina têkoşîna siyasî ne mimkûn e.

Li Navenda Çanda Mezopotamya, roja 21'ê rêbendana 1998'an li ser “Romana kurdî” gotûbêjek hate lidarxistin. Gotûbêjê ji aliyê dîrokanê lêkolîner İsmail Gölbaş ve hate birêvebirin. Wekî axivger jî nivîskar Mehmet Uzun û wergêrê Bîra Qederê Muhsin Kızılkaya beşdar bûn. Nêzikî 250 kesî li gotûbêjê temaşe û guhdar kir û bi pirs û eleqedarîyê baş beşdarî gotûbêjê bûn. Gotûbêjê bi axaftina İsmail Gölbaş dest pê kir û çar saetan dom kir.

Di axaftina xwe de Gölbaş li ser pirtûkên Mehmet Uzun sekîni û got: “Hege çiqas diroka roman-nivîsîna kurdî ne pir dirêj be jî “Bîra Qederê” û “Sîya Evîne” xwe xistine nav edebiyata navneteweyî”. Piştî axaftina xwe Gölbaş, pîrsek ji Muhsin Kızılkaya kir û got: “Ji bo çî we Bîra Qederê li tirkî wergerand?” Kızılkaya wiha bersiv da: “Mehmet Uzun ev bîst sal in ku bi biryardarî bi kurdî dinvîse. Zimanekî ku dixwestin ku ji holê rabe, Mehmet Uzun li wî zimanî xwedî derket.”

Li ser pîrsa Gölbaş a bi rengê, “We di wergera Bîra Qederê de têgihên kurdî çawa li zimanê tirkî wergerandin?” Kızılkaya got: “Zimanê kurdî di warê zimanê bajarî de bi pêş neketiye û zimanekî civaka gundiyan e. Ji ber vê yekê bi zimanê kurdî vegotina bajarî û dab û nêritên bajarî ne hêsan e. Lê Mehmet Uzun bi zimanê kurdî bajar baş şayes (taswîr) kirine.” Her wiha Kızılkaya bal kişand ser yekgirtî nebûna zimanê kurdî û da zanîn ku gelek peyv bi çend awayan tên bilêvkirin. Ev jî dihêle ku roman-nivîs zehmetiyê bikişîne.

Piştî van axaftinan Mehmet Uzun dest bi axaftina xwe kir û ji xebatkarên

NÇM spasdariya xwe pêşkêş kir. Uzun diyar kir ku piştî 21'ê saliya xwe ev cara yekemîn e ku derdikeve pêşberî xwendevanên kurd. Û got ku ji bo afirandina romana nûjen a kurdî, çî ji destê wî bê ewê bike.

Li ser pîrsa Gölbaş a bi rengê: “Ji ber çî we Bîra Qederê li ser jînenîgariya Celadet Bedirxan honand?” Mehmet Uzun sê sedem destnîşan kirin: “Yek; jiyana min di gelek waran de dişibîya Mîr Alî Celadet Bedir-Xan. A duyemîn di vî warî de gelek çavkanî li ber destê min hebûn, a seyemîn jî min xwest ku ez konseptê romana kurdî bi kar binim.”

M. Uzun li ser pêvajoya nivîsîna “Bîra Qederê” rawestiya û got: “Ji-ber ku kurdiya wî ya rojane ji bo nivîsandina romanekê dest nedida, wî li ser jiyana Celadet Bedir-Xan û serdama ku ew jiyaye nêzikî deh salan lêkolîn kiriye. Uzun ji bo vê yekê li Hawar, Ronahî û Rôja Nû kolandîye û bi gelek kesan re

Li ber yekîtiya zimanê kurdî astenga herî mezin pîrbûna alfabeyan e. Ji ber ku kurd sê alfabeyan bi kar fînin, heke di vî warî de yekîtiyek pêk bê wê, yekîtiya zimanê kurdî hê zûtir çêbe.

axiviyê. Li gorî roman-nivîsê kurd, ji bo wî tiştê girîng di romanên wî de hebûna hest û hêmayên (îmge) kurdewarî ne. Ji bo wî pîvana serkeftinê jî ev e. Eger ne wisa be romanên bi vî rengî wekî kop-yeke berhemên edebiyata cîran derdikeve holê.

Di gotûbêjê de xwediyê Weşanxaneyê Belgeyê û nivîskar Ragîp Zarakolu li ser yekîtiya zimanê kurdî û astengiyên


vê yekê pîrsek arasteyî Mehmet Uzun kir. Uzun li ser vê pîrsê da zanîn ku ji bo yekîtiya zimanê kurdî astenga herî mezin pîrbûna alfabeyan e. Ji ber ku kurd sê alfabeyan bi kar fînin. Bi dîtina M.Uzun heke di vî warî de yekîtiyek

pêk bê, wê yekîtiya zimanê kurdî hê zûtir çêbe. Her wiha wî bal kişand ser cudayetiya di navbera zaravayên kurdî de û wiha got: “Ev gelek şal in ku peywendiyên kurdan qut bûne. Ji ber vê yekê baş jî hev fêmnekirina kurdan tiştê normal e. Heke derfet çêbin, wê ew arîşeyên (problem) ji holê rabin.”

Wekî din li ser pîrseke wî da xuyakirin ku ew li ser destaneke bi dimilkî di-

ÇAVDÊRÎ

Nivîsa nivîskarê me nekete destê me



AMED TÎGRÎS



xebite. Lê ji bo ku konsantrasyona wî xera nebe, ewê hê demeke dirêj berhemên xwe bi kurmancî binivîse.

Beşdarê got: “Hûn ji bo çî li ser şerê Kurdîstanê tiştê nanivîsîn? Uzun di bersiva xwe de da xuyakirin ku berxwedana ji bo zimanê kurdî jî gelekî girîng e û got ku heke heya îro zimanê kurdî li ber xwe nedaya kurdan jî nikaribû li ber xwe bidin. Uzun bi taybetî bal kişand ser girîngiya têkoşîna çand û hunerî û diyar kir ku bêtî têkoşîna çandî serketina têkoşîna siyasî ne gengaz e. Wî axaftina xwe wiha domand: “Nivîskar divê di jiyana xwe de xwedî li rastiya civaka xwe derkeve. Rewşa îro ya kurdan min gelekî xemgîn dike û dixê bin bandora xwe. Ji ber vê yekê ev mijar wê xwe di pirtûkên min de jî bidin xuyakirin û ya yekemîn di rê de ye.” Wî got navê pirtûka wî “Ronî Mîna Evîne, Tarî Mîna Mirîne” wê piştî du hefteyan bê weşandin.

Sekreterê Giştî yê Komeleya Xebatkarên Avahiyan di Stenbolê

“Mîrza Mihemed ji bo me kel...

Armanca vekirina sazîyeke bi vî rengî çî ye?

→ Di temenê 75 salan a komara tirk de, di gelek warên xebatê de hewl û lebatên birêxistinbûnê hatine dîtin, lê mixabin em vî yekê nikarin ji bo karkerên avahiyan bibêjin. Gavên erênî di vî warî de nehatine avêtin. Lewre ji bo ku em xebatkar û karkerên avahiyan bikişînin warekî rêxistî, hewcedarî komeleyeke bi vî rengî çêbû. Îro bi awayekî giştî di nav kesên ku di vî statûyê de ne, ji her cure mafên civakî û ewlekariyê bêpar in. Sîgortaya wan tune ye, di nav mercên gelek dijwar de jiyana xwe didomînin. Ji ber ku karkerên însaatan di karên herî giran de dixebitin. Lewre jî nikarin çavê xwe vekin, ev yek ji rê li ber daxwazên baş digire. Ji ber ku em jî di nav vî sektora kambax de bûn, em çend heval hatin cem hev û me ÎÇD(Komeleya Xebatkarên Avahiyan) damezirand.

Kengî û li ku bingeha komeleyê hate avêtin?

→ Serlêdana vekirinê ya Komeleya Xebatkarên Avahiyan di dawiya sala 1996'an de hate kirin. Piştî heft mehan an go di nava sala 1997'an de, bi awayekî fermî komeleya me damezirî. Li Stenbolê îro em wekî navenda giştî kar dikin.

Çalakiyên we çî ne?

→ Piştî fermîbûna komeleyê, me lez da xebatên xwe yê rêxistîbûnê ku me berê ji dimeşandin. Bi piranî em di şantîyeyan de dixebitin, li wan deran em çalakiyên cur bi cur pêk tînin. Wekî mînak di sala 1997'an de li herêma Beylikdüzüya Stenbolê qawîşên hevalên me yê xebatkar şewitîn. Di wan qawîş û barakayan de kesî jiyana xwe wînda nekir, lê tu tiştê karke-


ran jî ji ber şewatê riha nebû. Em rabûn û me di nav endamên xwe yê rêxistî de dest bi xebateke berhevkirina alîkariyê kir. Bi derfetên kêr ji layê aborî ve hinek alîkarî alî gihîştê hev û bi vî yekê jî, ji serî heta binî me kêmasiyên hevalan bi cih anîn, me kinc ji wan re pêde kirin. Bi vî awayî piçekî be jî rewşa wan baş bû, lê vî yekê jî hêla moralê ve bandoreke gelekî mezin li wan hevalan hişt.

Ji bilî vî yekê jî bo ku xebatkar mafên xwe yê mirovî werbigirin, hewldanên me çêdibin. Em dixwazin yekîti di nav karker û xebatkaran de pêk were. Lewre jî bi giştî di vî çarçoveyê de xebaten me li herêma Beylikdüzü, Kemerburgaz, Küçükçekmece, İkitelli, Gebze, Sultanbeyli û Esenler didomin. Ev 2-3 meh in, xebatên me yê li van deran lez girtine.

Hûn dikarin hinekî din 'bûyera şewitîna baraka û qawîşên karkeran' vekin?

→ Belê bi rastî ev yek ji bo me jî girîng û hem jî balkêş e. Niha em li ser ihtîmalek mezin disekin. Herêma Beylikdüzü herêmeke girîng e ji bo xebatkarên kurdên avahiyan. Lewre her roj bi sedan avahî li wan deran tên avakirin. Bi hezaran xebatkarên kurd li wê derê bi şev û roj dixebitin. Pêwîst e ku bi wan re, hevdiîtin û danûstandin pêk werin.

Bi rastî jî em gelek caran diçûn vî herêma (Beylikdüzü) û li wê derê yekîti û rêxistîbûneke xurt pêk hatibû di nav xebatkarên kurdên şoreşger û welatparêz de. Li gorî me ev yek bû tirs û xof û kete dilê çavsor û zikreşan. Kesên çavsor û zikreş nexwazin yekîti û hevgerî di nav gelê kurd de çêbibe, nexwasim di nav derdorên kedkar de wekî sistema kapitalîstî qet nexwazin û ev kiryar pêk bên. Bi kurtasî em bibêjin çavê wan bar nebû jî yekîtiya



Gelek karker hene ku di rewşeke ku heywan jê tê de nikarin bişîn, dişîn. Em bi xwe jî di vî rewşê de ne. Di warê politikbûnê de jî rewş ne baş e. Sistem dibêje jî vir here, çî dikî bike, bixebite. Perê xwe bistîne li ku dixwî bixwe lê nebêje Kurd! Welat! Kesayeti....

me û xwestin bi şewitandina barakayan wan ji hev belawela bikin. Lê tiştê bal-kêş jî piştî vî bûyerê derkete holê. Karbidestê wan karkeran ku her gav karker ji 'sigortayê' dûr xistibû û sigortaya wan çênekiribû, sigortaya baraka, qawîş û avahiyan çêkiribû. Piştî re jî çû û pereyên xwe ji şirketa sigortayê standin.

Bi giştî endamên we kurd in, berî ku ew werin Stenbolê, wan li welatê çî kar dikir?

→ Belê rast e. Wekî ku we jî got piraniya endamên me kurd in, lê hejmareke hindik be jî di nav me de karkerên gelê din, mîna tirk, laz û ereb hene. Meseleya din: 'Gelo berê çî kar dikirin? Haa! Wekî hûn jî dizanin ev 15-16 sal in ku li welatê me jî hêla dagirkeran tirk ve şerekî qirêj tê meşandin. Bi hezaran însanên me heta niha li ser axa bav û bapîran xwîna xwe rijandine, 3500-4000 gund hatine şewitandin û valakirin, bi milyonan kurd jî li ser axa xwe nefî bûne, li seranserê cihanê


“Heta îro bi sedan karkerên kurd pakrewan. Bo nimûne hevalê Kurdistanê dîr bû, lê dîsa jî xwe wekî Mirza Mihemed ji bo me kel...

İNŞAAT ÇALIŞA...

belav bûne. Îro em dikarin bibêjin ku li Stenbolê Amedek, Sêrtok, Rihayek, Mêrdin û Batmanek hatiye avakirin. Bêguman ew însanên ku koçî metropol û bajarên mezin bûne, dibê ku li Kurdistanê karker, cotkar, dibe ku tucar, karsaz, mamoste an jî xwendekar û karmend bûne. Lê her tiştê xwe wînda kirine. Ji bo ku canê xwe jî nedin, reviyana hatine van deran. Êdî ketine rewşeke wiha xirab ku çî ji destê wan were wê bikin, wê bi erzan û belaş kar bikin û keda xwe bêrûmet bikin. Wekî mînak li welat mamoste an jî karmend bûye, an jî esnafekî dewlemend bûye, lê di Stenbolê de derketiye, heta êvarê di karê avahiyan de dixebite da ku êvarê gezek nan û qurçek av bibe nav zarokên xwe. Ez dixwazim bi vî mebestê vî yekê jî bibêjim; îro şerê qirêj ne bi tenê li Kurdistanê, her wiha li metropolan jî dixwaze kurdan bihelîne. Ji ber şerê li Kurdistanê îro li Stenbolê kurd bûne çavkaniya 'rant' ê. Ji ber ku her roj bi hezaran kurd ji ber zilma dewletê direvin tene van deran. Kurdên ku tene metropolan, ji bo debara jiyana xwe wê çî bikin? Dikarin di fabriqeyan de bişuxulin? Naxêr! Mecbûr dimînin ku karê însaatê bikin, karbidest jî bi rojaneyeke (yewmiye) erzan wan dide şixulandin û wan bêrûmet dike.

Li metropola Stenbolê ku ji gelek dewletan mezintir e, bi giştî rewşa karkeran bi taybetî jî, rewşa karkerên kurd çawa ye?..

→ Vî gavê kapasîteya bajarê Stenbolê ji bo xebatkarên avahiyan 250 hezar e, lê em dibînin ku 500 hezar karker li vî bajarî hene. Dema wisa be, çerxa kedxwariyê bi



Çabkarên Avahiyan Cebraîl Aksoy: "Me serokê rûmetê ye"

li têkoşîna rizgariyê de bûn
za Mihemed 1000 km. ji
qurban. Karker û xebatkarên
rûmetê ne."

lawela bûne, li hemberî xwe wekî robot bibîne. Lê em vê jiyane red dikin, tiştên ku sîstem dixwaze em dixwazin dijberî wê bikin. Bi kurtasî ne sîgorta û ne jî tu mafên ewlehî û însanî jî bo xebatkarên kurd hene.

Çiqas endamên we hene, bi giştî ew jî kâjan bajarên Kurdistanê ne?

→ Di halê hazir de nêzikî 600 endamên me hene. Gelek ji wan koçber in. Wekî herêm jî ew ji Mêrdin, Amed, Bilîs, Agirî, Tetwan, Riha û hwd. in. Lê ji tevahiye bakurê Kurdistanê endamên me hene.

Hûn xwe çawa finanse dikin, ango rewşa we ya aborî çawa ye?

→ Belê, li gorî zagona komeleyan mafê berhevkirina mehaneyan (aîdat) jî bo komelayan heye. Em jî ji bo ku bibe finansman jî her endamê xwe sê milyon mehane distînin. Em bi van pereyan kira xwe didin, heqê av û elektrîkê didin, pêdiviyên xwe yên din dikirin.

Nêrîn û ramanên hêzên dewletê der heqê saziya we de çi ne?

ya we ji hêla dewletê ve 10 rojan hate girtin. Sedema vê yekê çi bû, li hemberî vê yekê we çêkir?

→ Rast e! komeleya me ji hêla dewletê ve 10 rojan bi awayekî anti-demokratîk hate girtin. Sedem ev bû ku li komeleyê jî rêxistinên demokratîk nivîs, hin weşanên çepgir û Özgür Halk, Azadiya Welat û hwd. ditîbûn. Ha! Me çêkir? Ji ber ku me kongreya xwe nû çêkirîye û ez dema ku komeleya me heta girtin bi awayekî aktîf nedixebitîm, hevalê Cemal niha li vê derê ye bila ew behsa bûyerê bike.

Cemal Mete (endamê damezrîner): Belê wekî ku hevalê Cebraîl jî got saziya me ji ber hin hejmarên kovar û rojnameyên kurd 10 rojan hate girtin. Piştî ku biryara girtinê kete destê me, li gorî zagonên bingehîn, me serî li maseya komeleyan a emniyetê û li Komeleya Mafên Mirovan (İHD) û bi daxuyaniyeke çapemeniyê me, ev bûyer protesto kir.

Tê gotin ku ev 3-4 sal in gelek karsaz û karbidestên faşîst hîç kar nadin karkerên kurd. Ev yek rast e gelo?

alozi û tevliheviyek heye. Her çiqas di 15 saliya şerê têkoşîna Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê de, di her warî de pêşveçûn û destkeftin hebin jî, em nikarin vê yekê jî bo karker û xebatkarên kurd bibêjin. Lê dîsa jî heta îro bi sedan karkerên kurd di têkoşîna rizgariyê de bûn pakrewan. Berdêl dane û hê jî didin. Di vî warî de hevalê Mîrza Mihemed li metropola İzmirê bi 1000 km. yî ji Kurdistanê dîr bû, lê dîsa jî xwe kir qurban. Karker û xebatkarên wekî Mîrza Mihemed jî bo me keheha rûmetê ne. Divê rêxistibûn û hevgirtina me li dor van nixên heja pêk were. Dema wiha be, wê gelê kurd di demeke zûtir de bi ser bikeve.

Îro Karkerên kurd çiqas dixebitin, li gorî we divê çiqas bixebitin, pîvanên navneteweyî çi ne?

→ Ji bo xebatkar û karkerên ku ji Kurdistanê nû hatine, dirêjbûna dema xebatê zehf ne girîng e. Kesên ku wan digirin, çiqas bixwazin wan didin xebitandin. Karsaz û karbidest, xebatkarên kurd ne birçî dihêlin û ne jî têr dikin. Rewşa wan wekî kole û xulamên dema Spartakûs bi xwe ye. Tê bibêji çima?.. Ji ber ku wê demê kole jî nêza nedihatîn kuştin, lê têr ji nedibûn, ji bo ku baş bîn xebitandin. Bi kurtasî îro karkerên kurd 11-12 saetan dixebitin di nav mercên giran de, di vî warî de hinek endamên me bi xwe jî ji 12 saetan bêhtir dixebitin. Lê ji bo saeta xebatê, standarda navneteweyî 8 saet e. Li gorî me jî divê 8 saet be. Emê van mafan bistînin.

Ji bo pêşerojê plan û projeyên we, çi ne?

→ Di pêşerojê de, di 15'ê rêşemiya 1998'an de, şahiya komeleya me heye. Ev şahî wê bi navê "Şahiya Piştigiriya Komeleya Xebatkarên Avahiyan bi Kedkaran re" pêk were. Em vê şahiyê diyarî giyana şehîd Mîrza Mihemed Çimen dikin an go ev şahiya me ji bo bîranîna Mîrza Mihemed e. Jixwe Mîrza Mihemed jî bo saziya me serokê rûmetê ye.

Wekî din di pêşerojê de, em dixwazin li seranserê Tîrkiye û Kurdistanê şaxên komeleya xwe vekin. Li aliyê din em dixwazin bi saziyên derdorên tîrk re bikevin tîkîliyê û ber bi konfederasyonê ve herin, lê armanca me ya bingehîn ev e ku di warê sektora karên avahiyan de em bibin xwedî sendîka... Wekî encam em dixwazin bultenekê amade bikin.

Gelo saziya we xwe li ku dera Tevgera Azadiyê dibîne?

→ Em wekî Komeleya Xebatkarên Avahiyan dixwazin ku her gelê bindest qedê û çarenûsiya xwe bi destê xwe tayîn bike. Em aligirê mafê xwedêbirinê ne.

HEVPEYVÎN: SALIHÊ KEVIRBIRI

LARI DERNEĞİ



Karsaz û karbidest, xebatkarên kurd ne birçî dihêlin û ne jî têr dikin. Rewşa wan wekî kole û xulamên dema Spartakûs'in. Tê bibêji çima?.. Ji ber ku wê demê kole jî nêza nedihatîn kuştin lê têr ji nedibûn, ji bo ku baş bîdin xebitandin.

leztir dixebite. Ji ber ku piraniya karkeran kurd in, ev yek tesîreke giran li ser karkerên kurd dike. Niha karkerên tîrk jî ne di rewşeke baş de ne, lê dîsa jî di hinek waran de mafên baş didin wan û wan bi şertên baş didin xebitandin. Ev yek jî bo kurdan ne pêkan e. Rewşa wan kambax e. Gelek karker hene ku di nav mercên ku heywan jî tê de nikarin bijîn, dijîn. Em bi xwe jî di vê rewşê de ne. Di warê politîkbûnê de jî rewş ne baş e. Sîstem dibêje ji vir here, çi dikî bike, bixebite, pereyê xwe bistîne, bixwe vexwe, lê bi tenê nebêje kurd, welat, rêxistin û kesayeti...! Karkerên kurd bi giştî apolitîk in, zû bi zû nayên yekîti û rêxistibûnê. Dewlet dixwaze kurdan be-

→ Niha rewşa dewletê û nêrînên dewletê yên der barê kurdan de ez bawer im êdî zarok jî dizanin. Her çiqas bibêjin demokrasî heye û dewleta tîrk dewleteke demokratîk e jî, ev gotin derew in. Bi tenê ji bo ku fermîbûna saziya me bê peyitandin, şeş mehan em xapandin. Sîstem ango bîrdoz saziyên rêxistî naxwaze. Her çiqas dewlet rasterast û bi awayekî tund bi ser me de nayê jî, ev nayê wê wateyê ku dewlet jî me hez dike. Lewre em beşek ji gelê kurd in, bêguman bi çavekî xerab li me dinihêre.

Birêz Aksoy, hûn dibêjin dewlet zêde bi ser me de nayê lê, demek berê komele-

→ Bêguman ev yek rast e. Îro her wekî sîstema tîrk, karbidestên kapîtalîst jî derdorên xwedî hêz û rêxistî naxwazin. Ji ber ku derdorekî ku yekgirtî û rêxistî be, dema derkeve pêşberî karsaz û karbidestan, wê doza maf û keda xwe bike. Lewre jî dewlet û kapîtalîst her dem bi hev re tevdişerin. Û kar nadin kurdên birêxistî. Lewre kurdên nerêxistî nabêjin "na!" Patronên faşîst ku bûn holdîng û karê xwe wekî kartelan dimeşînin, kar nadin karkerên welatparêz û demokrat.

Li gorî we karker û xebatkarên kurd çiqas bi rêxistin in?

→ Wekî me berê jî got di vî warî de

Şanoyeke taybet:

“Komara Dînan: Şermola”

Navenda Çanda Mezopotamya bi hemû xebatên xwe ji bo çand û hunera kurdî xebatên heja dike. Yek ji van jî xebatên Teatra Jiyana Nû ne. Vê koma şanoyê di warê şanoya neteweyî de xebateke heja daye ber xwe, heta niha gelek listik pêşkêş kirine. Îsal jî Teatra Jiyana Nû bi listika bi navê “Komara Dînan: Şermola” derket pêşberî temaşevanên kurd. Ev listik ji çîroka Helîm Yûsiv a bi navê “Mirî Ranazin” hatiye wergirtin.

Listika Komara Dînan di serî de nezezaliyekê di nava xwe de dihewîne. Gelek mijarên cur bi cur ên wekî kêşeyên rêxistinî, belengazî, penaberî, rewşenbîrî û hwd. di nav listikê de cih digirin. Lê ya rastî jî ev e ku ji bo şanoya kurdî bingeheke xurt tê de heye.

Piştî listikê, me bi endamên Teatra Jiyana Nû re hevpeyvîneke kurt pêk anî û der heqê listika Komara Dînan de agahiyên di cih de standin. Li ser pîrsa me ya bi rengê; “*Ji bo çi we çîroka Komara Dînan li şanoyê anî, çi pêwîstî hebû?*”, bersiva Erdal Ceviz (di listikê de bi navê Smaîlo ye) wisa bû: “Tiştêkî taybet di vê listikê de heye. Ev, ji bo avakirina Teatra Neteweyî merheleyek e. Pîrgirêkên jiyana kurdan, nakokiyên di navbera wan de, belengaziya wan baş derdixe holê. Ji aliyekî ve tiştêkî rojane ye, ji aliyê din ve jî jiyana kurdan a dîrokî ye. Vî tiştî bi şexsiyeta kesên nîşan dide, ji hêla teatral ve jî afirandineke taybet heye. Em ji welat dûrin. Ev listika me hinekî me nêzîkî welat dike. Ji jiyana kurdan a rojane re bersiveke baş e.”

Kemal Orgun (Azado): “Li dinyayê her gel xwediyê Şermolayekê ye. Şermola kurdan jî heye, lê bi awayekî veşarî. Ew ji nû ve tê xuyakirin û fêmkirin. Her çiqas jê tê fêmkirin jî, ji ber ku li welat şer heye ji Şermola dûr dikevin. Şermola pêwîstiyek e. Kesên ku di listikê de rol girtine bi rastî di jiyana kurdan de hene. Kesên ku ji welat dûrin, em dixwazin bi listika Şermola welat binîn bîra wan.”

Di listikê de gund tîn firotin, îro jî tîn şewitandin. Hûn çawa dinirxînin?

Kazim Ekinci (Şêrbello): “Gund tu car nayên firotin. Lê bi hezaran gund hatine valakirin, şewitandin. Di listikê de listikvanê dîn gundan difiroşe. Lê gava dor tê ser gundê wî, dibêje ez nafiroşim. Ma ez gundê xwe bifiroşim, ku ez Amûdê bifiroşim ez ê herim ku?”



Nazmi Kırık (Şexo): “Şermola mesajên pir girîng ji gel re dişîne. Mijara firotina gundan, tîkiliyên wî bi gunde şewitandî re jî heye, bi kesên ji welatê xwe direvin jî heye. Ji kesên ku ji gundê xwe direvin, û ji welatê xwe dûr dikevin, rexneyên mezin dişînin.”

Yemlihan Adıgüzel: “Kesên ku gundan vala dikin, mirovan jî welat dûr dixin, di listika Şermola de baş tê şirove-

kirin.”

Di listikê de qala penaberiyê dibe, qala Îtalyayê dibe. We ev tişt çima lê zêde kir?

Erdal Ceviz (Smaîlo): “Ji ber ku kurd ji welatê xwe dûr ketine, ji ber ku li welatê xwe najîn, girêdanek di navbera wan û gundê wan de heye. Belkî ji sazûna çandî wisa çêdibe. Perga-

la serdestan îro dixwaze tekiliyên kesên ên manewî ji holê rake. Di listikê de hevalê ku rola ye dîn dilîze, di rastiyê de gundan nafiroşe. Li van gundan bi hêzeke xurt xwedî derdikeve. Lê mixabin em bi civakî li gundê xwe xwedî der-nakevin. Îro penaberiya kurdên ku çûne Îtalyayê di rojevê de ye. Jiyana me ev qas bi hev ve girêdayî ku her çiqas bi çîroka Helîm Yûsiv ve tîkîlî tune be jî, li cihekî digihêje hev.

Di listikê de jin xwe baş tîne zimên, wekhevî heye. Lê di rastiyê de ev zêde xwe xuya nake. Hûn çi dibêjin?

Saniye Tunç (Xanimê): “Jinên di civaka me de xwe îfade nakin. Di listikê de (Xanimê) hez ji her kesî kiriye û dîn bûye. Lê bi dînbûna xwe dixwaze xwe îfade bike û ji vê karakterê baş tê hez kirin.”

We di listikê argo baş bi kar aniye. Hin kes dibêjin, divê em argoyê kedî bikin, hûn vê ramanê çawa dinirxînin?

Kemal Ulusoy (Hîndero): “Bi rastî tiştê ku di jiyana me de heye, çima em di hunerê de pêşiya wê bigirin. Me di listikê de argo bi kar anî. Ji ber ku di listikê de dîn dilîzin hinekî zêde bi kar hatiye. Ku rola me ne ev bûya, belkî jî me cesaret nekira. Lê divê di hunerê de argo cih bistîne.”

Hûn di listikê de li Xwedê digerin, wêneyê Xwedê çêdikin. Hûn ji reaksiyona gel netirsyan gelo?

Murat Batgî (Newafo): “Helîm Yûsiv xwediyê zanî û cesareteke pir mezin e. Wî li derdora xwe mîze kiriye û surrealîzmek baş derxistiye holê. Kesên ku li dora xwe binêrin wê normên hunerê baş bibînin. Şermola rastiya kurdan baş diyar kiriye. Em xwe di gelek tiştan de teng digirin. Divê bê zanî ku huner ancax karibe wî mîjîyê fireh bike. Me xwest em bersiva tiştan bidin, kêfa gel jî jê re hat.”

Hûn mesajên xwe digihînin gel, temaşevan der heqê listikê de çi difikirin?

Murat Batgî: “Ez bi gelek temaşevanan re peyivim. Dibêjin gava ku hûn komarê ava dikin, gelek kes bi hestên xwe bi we re komarê ava dikin. Tiştên ku em dibêjin tîn fêmkirin.”

Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

- 24.01.1998. Şemf: Şano- Teatra Jiyana Nû. "Komara Dînan Şermola" Saet: 14:00. Konser- Hozan Xanemîr. Saet: 17:30
- 25.01.1998. Yekşem: Şano- Komara Dînan Şermola. Saet: 14:00 Gotêbêj- ' Medya û Siyaset' Koray Düzgören Saet: 17:30
- 28.01.1998. Çarşem: Semîner- "Rewşa raberî îroyîn ya aboriya Kurdistanê." Ahmet Kaya Saet: 17:30
- 30.01.1998. Fr: Film- "Nêrîna Ullis." Saet: 18:00

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ




Li NÇM'a İzmirê

- 24.01.1998. Şemf: Şano- Prometeîq. Saet: 18:00
- 25.01.1998. Yekşem: Konser- Koma Şengal. Saet: 18:00
- MED-KOM
- 24.01.1998. Şemf: Konser- Ozan Bengîn. Saet: 17:00
- Li BEKSAV'ê
- 24.01.1998. Çarşem: Film- "Diranê Spi" Rondal Kleîser
- 29.01.1998. Pêncşem: Film- "Li Hekariyê demsalek" Erdem Kral. Saet: 18:30

Ev Jakal e ne Çakal!

Di film de ne jiyana Carlos ne jî jiyana mirovekî bi wî rengî xuya dike. Fîlm, li gorî mirovekî ku di warê xwe de jêhatî û şarezaya ye bi ser neketiye. Senaryoya film bi tenê li ser berberiya çend kesan hatiye honandin.



ÎRA'yê jî bi kar tînin. Di vê hevkarîyê de wekî her car tekoşînê neteweyên bindest wekî terorîzm tînin binavkirin. Ev mîlîtanên ÎRA'yê jî ber raboriya xwe poşmaniya xwe tînin zimên. Film di vî warî de rewşa kedîbûyî ya Rambo ye. Li ser vê yekê wan mîlîtanên ÎRA'yê li dijî Carlos bi kar tînin.

Di destpêka film de birayê Serokê mafya rûsî ji aliyê FBI û KGB'yê ve tê kuştin. Li ser vê yekê Serokê mafya rûsî ji bo ku tola xwe hilde, Çakal wekî mîrkûjekî kirê dike. Di destpêka film de wisa xuya dike ku mafya rûsî fermana kuştina serokê FBI'yê daye Çakal. Lê di dawîya film de hate dîtin ku ferman ji bo jina serokê DYA'yê hatiye dayin. Mîlîtanê ÎRA'yê ku ji girtîgehê derxistine û ji bo vê oparesyona Carlos bi kar tînin, bi vê yekê dihesê û planên Çakal têk dibe. Di vir de tê xuyan ku ne ji mîlîtanê ÎRA'yê bûya KGB û FBI'yê wê nikarîbûna planên Carlos xera bikirana. Di dawîya film de Çakal ji aliyê mîlîtanê ÎRA'yê ve tê bidestxistin. Bidestxistina Çakal bi awayekî hêsan me şaş nekir. Lewre di serê film de mîlîtanê ÎRA'yê sond xwaribû, ku ewê Carlos bikuje. Bi kurtahî her çiqas filmekî perosîner be jî jî huner û hilbijartina listikvanan ve gelekî paşketî ye. Ev yek bi taybetî ji bo Bruce Wills û Sidney Poiter berbiçav e. Hemû taybetiya film di navê "Jakal" de veşariye. Kapîtalîzm pêşîn gemasên derewîn diafirîne pişt re jî ji wan sûde werdigire. Film ji bo maceraperestan hêjayî temaşekirinê ye.

SERWISA ÇANDÊ

TÎŞK

Yadî germ bo duyî rêbendan



SÎRWAN REHÎM

P enca û du sal lemeber, le berfanbar û le rêbendanî Sablax da, le rojhelatî niştîman, le ser destî mirovgelêk ku paşkoşî geray le giyanî têkoşanyan da nexistîbû, Komarî Kurdistan le dayik bû. komarêk ke pêşewayekî be raşikawî raydegand û deywit: Ew xorey ke lere helatiwe, tîşkekanî hemû Kurdistan degretewe.

Raste Komarî Kurdistan le encamî hatne na êranewey hêzekanî rûs û Inglîzewe ke be howeye desthelatî Reza Şahy tê da îflîc bû, hate kayewe. Belam drûstbûnî ew komare ew pendeş we bîrdexatewe ke serkirdey xemxor û partî dirûst, detwanin helî dîrokî le berjewendî netewe be kar bihênin û neyken be qurbanî hez û wîstî bêmanay xoyan.

Pêşewa û têkoşeranî tirî dîmokrat tiwaniyan komerêk çêbiken ke le temenî kurtî da, geşaneweyekî berçaw li biwarî jiyani, komelayetî, aborî perwerdeyî û ferhengî da, debînrêt. Hêzî pêşmerge, yaxûd leşkirî millî sazdekrêt. Bernamey xwendin û perwerde dekrêt be kurdî û li biwarî roşinbîrîş da. Çendin bilawkirawey corawcar le şarekanî Kurdistan dête arawe. Radyo û sînema dedemezrên û kitêbxaney millî pêk dêt.

Ew belên û peymaney Qazî Mihemedî pêşewa le sêwêndekey da be gelî kurdî dedat, belên dîro û çawbest nîn, hen boye le gel ciwanemerg banî komarda, emîş le merg nizîk debêtewe û diwatirîş koneperistan û dîjîmanî azadî le sêderay deden.

Hêminî şair derbarey le sêdaredanî pêşewa delê; Deryayek zanîst û edeb, deryayek fikr û bîr, be destî zordarêkî, serero û nezan wişk kira û le naw çû.

Belê zor deryay zanîst, edeb û serfirazîman be dest zordare serero û nezanekeke wişk kiran û bo xoşman pendman lê wemegirtin. Birînekan be swên. Le defterî bîreweriyekanman da, roje şumekan pirin, belan lewan be jantir û be swêtir derizwemegirtine lêyan.

Ey rohî bilind û bêgerdî pêşewa ger heltekene. Ba zewî şeqar şeqar bêt û le kawlaşî Kurdistaneket birwane. Birwane çon be dest nasalarî serok xêl û piyawey nezanekeke girîwarduwe û denalênê.

Serwerim... Ew kurdistaney ke êwe be hîwa bûn tîrêjî Mehamadîb hemû kuce û qujînekeke şedarî bigrêtewe, birwane. Paş ewe seranî bê serî kurd çon niskoy pêdeben û çanî benew kwêre rey nehatî deben.

Ey pêşewa şehîdeke.... Xo êwe le ser kursî sêdareş serberzane rawestan û wekû serî Qûlqûlaxê her be bilindî manewe û neçemanewe. Tenanet pêtan şerim bû çawîstan girê bidin, çunke le serbelindî xotan dilniya bûn.

Dey ey rohî piroz bo gor helnatekênî û boçî na pirsît ke em newaney ewê, em mîratgiraney ewê, boçî le hemberî gel barî gewre û belay giranin û boçî awaş beranber be dîjîman çawşor û sernewîn? Boçî û le pay çî em kurde bêweye berew engusteçaw deben û rencbêwerî deken?

Selaw le yadî komarî Kurdistan û pêşeway gelî kurd, ke le malawayî sedey bîstem da, yadî bê xweş û bê peley şermezarî le mejûy têkoşanman de be cê dehêlin.

Çîrokeke nîvco

Wexta xaltîka wî bi Badîn re zewicî, ku baskên wî hebûna wê bifiriya. Ew maşûqî çîrokên Badîn bûn. Di çîrokên Badîn de cîn, perî, bi-huş, dê û bavê wî, kesên dîl, xizan, erdnîgariya wî... hebûn.

Ji rojê hez nedikir. Çiqas şixulên giran hebûn wî dikirin. Bi êvarê re pişt li wî ditewiya. Şazdeh salî bû. Carinan li dangiyê, berê xwe ber bi rojê ve dikir, ta roj biçûya ava. Carinan jî ji bo ku roj zû bi zû biçê ava dua dikir.

Ew roj, bi wî, bi qasî mehekê dirêj bûbû. Çîroka roja çûyî nivco mabû. Jixwe tîkiliyên bav û dayika wî mal li ber çavên wî reş kiribû.

Êvarî cilên gemarî derxistin. Şalê xwe yê sor li xwe kir. Li ber neynikê porê xwe şil kir, talî şe kîr. Dayika wî bi xeyd û gazin:

– Te dîsa porê xwe şil kir, tu yê bimirî, di vê sir û seqemê de...! Ez mame şaş metel; wexta xortin mîna kûçikan bi dûv keçikan dikevin, dibin xwedî jin, rûmeta jinê bi qasî kûçikan li cem wan namîne...

Çû mala Badîn. Şîrîn jî hatibû wir. Şîrîn behsa diwazdehê îlonê (rezberê) dikir. Zarok tev de di koşeyê odeyê de li hev û du civiyabûn. Stû di ser Badîn de xar kiribûn. Cemo, wekî dilê wê bi zarokan bişewite, peyva Şîrîn birî;

– Lo lo birawo, weleh bileh li vê dinê çi biqewime, di serê me kurdan de diteqe. Xwezîla şerekî mezin derketibûya an erê na na... Em di vê rezîliyê de pûç bûn...

Badîn çîrok jî serî de vegot, lê dîsa dawî lê neanî...! Zarok tev de rabûn. Ta-

xa wî dûrî mala Badîn bû. Bi tenê meşiya. Dinê sayî bû. “Qere lastîk” di lingên wî de hişk bûbûn. Ji ber ku xwe xort dihesiband, bişkokên îşlikê xwe heya ser dilê xwe vekirî hiştibûn.

Gihîşt nik kaniyê. Komek kûçikan, êrişî wî kir. Ferek ji solên wî di nav berfê de ma. Xwe avêt hewşa mala Yado. Ji tîrsa kûçikan xwe bi diwêr ve zeliqand. Dêlikên bi ba û kûçik diçûn û dihatin. Ji xeynî tîrsa kûçikan, tîrsa Yado jî ket dilê wî. Ji hêleke ve jî bi lingê xwe î tazî re mijûl dibû. Bi qasî saetêke li wir ma. Hindik ma ku tava heyvê were ser wî. Serê xwe da diwêr, serê wî li banokî ket! Banok hilda û avêt dêlikê. Dêlikê bazda, kûçik tev de li dûv wê reviyân.

Ji sermayê mîna ku taya mirinê pê bigire diricifî. Dev û lêvên wî li ser hev din nedisekinîn.

Gihîşt hemberî mala xwe. Lampeya wan wekî çîrûskeke zelûl diçûrûsî. Bi kêf û bi bez dimeşiya. Ji nişke ve pêrgî Sariya û lawê wê hat. Di destê Sariya de fanos hebû. Ji rewşa wan kifş bû ku li tiştêkî digeriyan. Jê Pirsî:

“We vê şevê xêr e, hûn li çi digerin?”

Lawê Sariyayê:

– Em li dojeha bavê wê qîza...

Sariya peyv di devê wî de girt:

– Bêbava bûka me deriyê gomê vekirî hiştiye, dikê me wînda bûye!

Ji wan re got:

– Hûn bimînin di xweşiyê de...

Û derbas bû. Di ber deriyê goma xwe re derbas bû. Dengê girîna jineke hate guhê wî. Deng bi wî ne xerîb bû. Hinekî ber bi dergeh ve çû, nihêrî ku bûka Sariya ye! Bi tena kiras, xwîna herikîbû, li ser kirasê spî bûbû cemed. Bi fedî ji bûkê pirsî:

– Çi ye, qey we dîsa şerê dinê li dar xistiye?

Got:

– Goreya min derbixe, lingên min miz bide.

Min jî got:

Lingên te çiqas bêhn didin, ka bişo, ez paşê miz bidim.

Rabû ser piyan û bi bêrika sobeyê li min da...! û got:

– Te ji bo xwendinê ez kirim qurban, avêtim devê guran. Ma te soz bi min bida, wê dinê xera bibûya... Weleh bileh ez ji ber derbeyên bêrikê dimirim, bila dil li te û li wî xweş bibe...

Bişkokên îşlikê xwe pev xistin. Piştî xwe da dergehê gomê. Hilma mih û bizînan xeweke giran, xeweke mirinê kir çavên wî. Destê xwe da arûgên gomê.

Çivikê destê wî nikul kirin. Ji ber kela dîl û hiske hîskan, girî di qirika wî de bû bombeyeke neçariyê. Pêşgira ku wê çekiribû ji bêrika xwe derxistû got:

– Ka biavêje ser sînga xwe.

– Tew, goştê ku neyê hezkirinê be, gemarî ye, tal e, ziqûm e...

– Ka, ez û tu bizewiciyana wê çawa bibûya?

– Me ji hev û dû hez dikir. Wê zarokên me hebûyana. Te li min nedida. Ez dibûn koleyê te!

– Bavê min û dayika min jî ji hev û du pir hez kirine. Va yê zarokên wan jî hene. Li hev û din bûne marê reş. Ku tu ji koletiyê hez dikî, here bibe koleya mêrê xwe.

– Hey Xwedê! Tu jî bédeng mayî! De min bike bizineke pişik xerabûyî, de min bike kevirekî pûç, de min ji vê êşê xelas bike... Xwedê de deriyê yên ku bûn sedem bişewitîne...!

– Here mala xwe. An na mêrê te bizanibe ku min tu bi tena kiras dîtiye, wê yek berikeke sar berde serê te.

– Ka ew roj! Qedera me ye! Em giş bi êş û kulên dizî, veşarî dimirin.

– Keçê! Bi Xwedê hindik maye ku ez bimirim, dîl li min bûye cemed...

– Ez ji bo xatirê te diçim, ji xwe bêcare me jî...!

Dayika wî derî jê re vekir. Bi vekirinê re qîriya:

– Kê mal li min mîrat kir, tu di vî halî de hiştî?

– Dêl û kûçikên gundiyan.

Bavê wî wekî ku li keysa xwe bigere:

– Ev hezar car e dibêjine we ku kes ji me hez nake, de bibêje zaroyên kê bûn, çend heb bûn?

– Na bavo! Tu kesî li min neda, bi şêxên melekan, bi Goşkar Bava dêl û kûçik bûn. Sola min di berfê de ma, ez cemedim.

– Min pere deyn kirin, ew sol kirin, xwezîla dêl û kûçikan tu parçe bikirana. Tu di diya min... tu yê welê bêsol bimînî... Belkî çîrokên Badîn serê te dixwin, ez jî ji te xelas dibim...

Salek derbas bû, bûka sêwî kor bû. Taliyê ji ber êş û kulên veşarî mir. Şevêkê avrêlê çû şer gora wê. Lingên xwe li gora wê da û wiha got:

– Hey, kes ji bo ling mizdanê te li wê deverê nakuje, zû birize ta ku tu ji gul û kulîkên biharê re bibî şiv û paşiv.

Li malê li ser rûpeleke pirtûkê ev rêz nivîsîn:

– Kî lingên xwe bi kê bide şuştin û mizdan, ker lawê kerê ye, xinzîr e, kuçikê nav gund e.

Dil li wî hêsan nebû. Dirûşmeyeke “komunist û kurtçî” bi bîr anî û li dûv hev rêz kir:

“Bimire koletî! Bimire koletî, bimire kole...”



Kaseta Koma Dengê Biratî: Narinê

Hêzên dagirker ji roja roj ve, her tim qesta valakirina Kurdistanê kirine. Bi vê mebestê mirovên kurd hin caran bi darê zorê ji welêt dûr xistine. Hin caran jî ji ber mercên giran ên aborî gelê kurd bêgav maye ku ji welatê xwe dûr bikeve. Piştî destpêkirina şerê çekdarî, bi taybetî jî piştî sala 1993'yan ku hêzên dagirker li dijî gelê kurd dest bi şerekî tomerî (topyekûn savaş) kir, ev xebata valakirina Kurdistanê gurtir bû. Rayedarên dewleta tirk navê, "ji bo xeniqandina masiyan, ziwakirina behrê" li vê xebata xwe kiribûn.

Lê vê êrîşa dagirkeran li gorî daxwaza wan encam neda. Kurdên ku derketin derveyî welêt jî, dev ji doza xwe bernedan, doza neteweyî anîn çada navneteweyî. Bo nimûne îro li metropolên tirk bi dehan komeleyên kurdan hene. Wan komeleyan li gorî rewş û pişeyê xwe dest bi xebata siyasî û komelayetî kirine. Digel komeleyên pişeyî û siyasî hin komeleyên herêmî jî bi xebata xwe balê dikişînin ser xwe. Di vî warî de komeleya KAYY-DER şayanî behsê ye. Kurdên derdora Çewlikê di nava vê komelêyê de xebatê dikin. Endamên komelêyê li ser çand û hunera kurdî xebatên hêja dikin. Komên muzîk, govend û şanoyê di bin banê vê komelêyê de xebatên xwe dido-

mînin û berhemên baş didin.

Kaseta Koma Dengê Biratî ya bi navê "Narinê" jî berhemek KAYY-DER'ê ye. Di vê kasetê de bi giranî stranên gelêrî cih girtine. Bi piraniya stranên ku di kasetê de hatine tomakirin ji aliyê endamên komê û NÇM'ê ve hatin berhevkerin. Digel van stranan, hinek stran jî ji aliyê endamên komê ve hatine çêkirin; strana bi navê "Ew sê bûn" bi awaz û naveroka xwe serincrakêş e. Ev stran li ser şehîdên welêt hatiye çêkirin.

Di nav stranên ku hatine berhevkerin de, strana ku hê di destpêkê de balê dikişîne, strana bi navê "Elifê" ye. Ev stran bi awaza xwe, hê di destpêkê de dilê mirov geş dike. Di gotinên wê stranê de hunermendiya gel û taybetiyeke wêjeya gel heye; naverok ne tîr tîjî ye, lê bi zimanekî sivik û qalibekî

ku mirov dikare bi hêsanî ji ber bike, gotin hatine lihevanîn. Ev stran ji aliyê Gêxiyê hatiye berhevkerin. Her wekî me berê jî dabû xuyakirin, muzîka gelêrî di kasetê de gelêrî ye, lê di kasetê de digel amûrên muzîka gelêrê yên mîna tembûr, keman, ney, zirne, mey, amûrên mîna gîtar, keyboardê jî hatine bikaranîn. Kasetê Koma Dengê Biratî li tomargeha Kom Muzîk Yapımê hatiye tomakirin.

SERWISA ÇANDÊ



Kovara Nûbihar

Hejmara 58'an a mehnameya çandî, hunerî, wêjeyî Nûbihar derket. Ev hejmara kovarê bi pêşekeke ku tê de li ser tengasiyên li ber kovarê radiweste, dest pê dika. Dûv re sergotara bi navê "Cihanbînî" tê. Ev nivîs ji aliyê Ali Karadeniz ve hatiye nivîsin. Karadeniz di vê nivîsê de li ser pêkhatina taybetiyên civakî û hêmanên civakbûnê radiweste. Di nivîsê de ziman wekî hêmana bingehîn a civakbûnê hatiye destnîşankirin. Lê nivîskar dide zanîn ku hevpariya zimên ji bo têgihîştina ji hev ne bes e, divê mirov xwediyê cihanbîniyeke hevpar be jî.

Di vê hejmara kovarê de giranî li ser nivîsên der barê zimên de ye. Bo nimûne R. Karakaya serpehatiyên xwe yên li ser zimanê zikmakî vedibêje. Ferid İzol di nivîsa xwe ya bi navê "Zimanê ponijîne û avakirina sazûmana ramanî de" balê dikişîne ser tîkiliya zimên û ramanê. Di vê hejmara kovarê de hevpeyvîna ku Ali Karadeniz digel

Ferhad Shakely pêk aniye, cihê herî berfireh girtiye. Di vê hevpeyvîne de Shakely li ser huner, hunermend, rêbazên hunerê bîr û boçûnên xwe gotine. Bi taybetî li ser Melayê Cizîrî Shakely nixandînen balkêş dika. Lê belê mirov di sedema helwesta wî ya reaksiyoner a li hemberî rêxistinên kurd û baweriya marksîst nagihêje û di gelek cihan de mirov bi nixandînen wî yê dîrî rastiyê zivêr dibê.


"Dubeytî" yên Baba Tahîrê Uryan di vê hejmarê de jî didomin. Sabah Kara wan ji lori werdigêrine kurmançî. Kerem Soylu, helbesteke Mela Zahîdê Hezroyî ji tîpên erebî

guhêstiyê latînî. Wekî din Xweşbêj, Ö. Faruk Çetinkaplan bi helbestên xwe, Felat Dilgeş, M. Emin Bozarslan, Abbas Alkan bi çirokên ku berhev kirine di vê hejmarê Nûbiharê de cih girtine. Ji bilî helbesta bi zaravayê kirmançî (kirdkî) "Wa kes nêvîno" ya Ö. Faruk Çetinkaplan, hemû nivîs bi kurmançî ne.



Înisîyatîfa sivîl

OSMAN ÖZÇELİK



Di heştê vê mehê de, di rojnameya "Milliyet"ê de, Şahin Alpay nivîsarek nivîst, ku min dixwest herkesî bixwenda. Ş. Alpay di vê nivîsarê de, li ser pirsgirêka kurd radiweste û helwesta dewletê rexne dika. Nivîskar, ji du nûçeyan derdika ser rîya nivîsara xwe. Ev nûçe li ser birîngan ku Sekreterê Giştî yê MGK (Konseya Ewlekarî ya Dewletê) daye karmendên dewletê yê payebilind e.

Alpay dibêje ku; Sekreterê Giştî yê MGK'ê wiha gotiye: "PKK hêza xwe ji kurdayetiye distîne. Lê belê kurd jî, ji qewmên tirk ên ku ji Asya Navîn koç kirin in. Ji ber vê yekê yen ku divê em bi kurdan bidin bawerkerin ku ew tirk in." Nûçeyê din jî ev e; Serkaniya giştî ya artêşa tirk jî, birîngêk daye karmendên payebilind ên serokwezaretîya Tirkiyeyê û ji wan re hatiye gotin ku; "Tevliheviya nasnameyan, xetere û tehdîdeke herî mezin e. Ji me tê xwestin ku em nasnameyê cuda bidin însanên xwe yê Rojhilatê Başûr û wan bi vî awayî jî ji xwe bi dûr bixin. Divê em nehêlin

tevlîheviya nasnameyan derkeve holê."

Şahin Alpay, birîngan wisa şrove dika. Dibêje, bi wan birîngan derket holê ku, li ser pirsgirêka Rojhilatê Başûr dîtin û ramanên dewletê nehatine guhartin. Di nav serdarên artêşê de, yê ku dibêjin ger em qebûl bikin ku Tirkiye ji gel û neteweyên cuda pêk hatiye wê Tirkiye perçe bibe, ne hindik in. Û ji ber vê yekê ye ku leşker vejeriyar serê serî û dibêjin: "Kurd, tirkên çiyayî ne ku tirkbûna xwe ji bir kirine."

Nivîskar dide zanîn ku, bi xwezayî ew dizanin rêveberên dewletê yê sivîl û yê leşkerî hemû ne bi van dîtinan re ne. Alpay berdeyam dika: "Gelê Tirkiyeyê dizane ku, ji bo ku ev pirsgirêka me ya sereke çareser bibe, divê PKK bê eciqandin, li Rojhilatê Başûrê welatê me pêşketin çêbibe û nasnameya kurdan bê naskirin. Lê belê çî heyf hêj Enqere di vê rastiyê negihîştîye."

Li gorî Alpay, qebûlkirina nasnameya kurd, nayê wê wateyê ku wê dewlet bi PKK re li ser maseyê rûne. Mane ew e ku hemwelatiyên bi binyata xwe kurd in, ger bixwazin, wê bikaribin di perwerdebûn û ragihandinê de zimanê xwe bikar bînin. Û bêyî ku nasnameya xwe veşêrin bikaribin siyasetê bikin.

Ş. Alpay diyar dika ku, naskirina nasnameya kurdan wê bihêle ku kurdên li nasnameya xwe xwedî derdikevin, wekî 'nasnameyê jorîn' tirkbûnê jî qebûl bikin û bi dilsozî xwe bi Tirkiye ve girêbidin. Nivîskarê me yê demokratîk dîtinên xwe wisa zelaî dika. 'Riya

tirk-kirina kurdan, di pejiwandina nasnameya kurdan re derbas dibê. Ger em vê politîka xwe ya kevn berdeyam bikin, emê kurdan biavêjin hambêza PKK û nijadperestên kurd ên hov."

Çi leşker û çî bürokratên sivîl; çî rastgir û çî çepgir, neviyên Osmanîyan ji me re tu riyê nahêlin. Wan qenc kirine aqilê xwe û biryar dane ku me bikin tirk.

Rewş ew qas eşkere li ber çavan be jî, dîsa çend rewşenbîrên me derketine holê, vir de wê de baz didin. Telefon li ser telefonan, civîn li ser civînan. Teşqe û şerpezebûnek bêhewa dimeşe...

Sedema vê şerpezebûnê hat fehm kirin.

Tu nabê 'hinekan' 'enformasyon' daye: 'Dewlet dixwaze gavinan biavêje'.

Çi gav, çima navêje? Ne diyar e.

"Dewlet naxwaze bi PKK'ê re li hev rûnê..."

"Çima?"

"PKK rêxistineke leşkerî ye."

"Lê dewlet! Ma qey dewlet bi sivîlan şer dimeşîne?"

"Dîsa jî dewlet dixwaze înisîyatîfê sivîl hebe."

"HADEP, PKDW, NÇM û gelek sazî û rêxistinên kurdan hene. Ma qey ew ne sivîl in?"

Bi binçav de ji bo ku mirov ji polis re biaxivin, polîsên ku îşkenceyê dikin hene û yê qenc(!) Mirov ne bi tecrûbe be, dikeve dafta polîsên qenc û çî zanibe dibêje.

Ev înisîyatîfa sivîl ne dafta "hinekên" qenc be û ne li pey perçekerina me be? Gelo tu tevdîrên me hene?

Zêr û zirîna ker

Mele û gundiyên bêlimêj

Zilamek rojekê di kuçeyekê re derbas dibe. Bala xwe didê ku di destê gedeyekî piçûk de zêrek heye. Mêrik ji lawik re dibêje:

- Birazî, tu kanî wî pelikê destê xwe bidî min, ezê şekir bidim te.

Ji mêrik ew e ku lawik nizane ku ew pelikê di destê wî de zêr e. Lawik zarokêkî biaqil û jîr e. Ji mêrik re dibêje:

- Apo ne hewce ye ku tu şekir bidî min. Şertekî min heye, tu şertê min bi cih bîni ezê bêyî şekir vî pelikê bidim te.

Mêrik dibêje:

Şertê te çi ye?

Lawik dibêje:

- Apo, tu sê caran wekî kera bizirî, ezê vî pelikê bidim te.

Mêrik li dora xwe dinêre ku tu kes tune, ji xwe re dibêje ji carek zirîne tu zîrar tune ye û sê denga dike zirî.


- Aiiiiiaaaaaarrrrrr....

Paşê ji lawik re dibêje;

- Kanî wî pelikê destê xwe bide min.

- Apo çima tu bi vî kerîtiya xwe dizanî ku vî pelikê di destê min da zêr e, çima ez bi vî însanetiya xwe nizanim ku ev zêr e!

SEYDO BAŞÇI



Mele, ku li gund dest bi meletiyê dike, bala xwe dide ku, haya gundiyan ji limêjê tune. Kesek nayê camiyê û limêjê nake. Bangî gundiyan dike û nesiheta li wan dike, dibêje;

- Ji bo çi hûn limêj nakin?

Gundî giştîk ji mele re wiha dibê-

jin:

- Mele, weleh em dixwazin limêjê bikin, lê belê em karker in, em rênber in, em feqîr in, kincên me gemarî ne. Ji ber wê yekê em nayên camiyê. Li qisûra me nenêre.

Mele difikire ku gundî nayên camiyê, ji wan re wiha dibêje:

- Bila kincên we gemarî bin û ne hewce ye ku hûn solên xwe jî ji lingên xwe derxin. Tevî sol û kincên gemarî jî werin camiyê, limêjê bikin.

Di wê navberê de, gundî hîni camiyê dibin û diçin camiyê limêjê dikin. Hinek fesda ji miftîlixê re diçin gilî dikin, dibêjin;

- Meleyê filan gundî, bêdestmêjê û tevî sol û kincên qilêrî, di camiyê de, bi gundiyan limêjê dide kirin. Li ser vî yekê, miftîlîg mifetişên xwe dişîne wî gundî. Dêhna xwe didê agahiyên ku hildane rast in. Ji mele re dibêje;

- Seydayê delal, ma qey tu car bi kincên gemarî û tevî sol û bêdestmêjê limêjê dibe?

Meleyê gund li mifetişan vedigerîne û dibêje;

- Heyran, min gundî bêdestlimêjê û tevî şola anîne heta hundirê camiyê. Ku tu û miftîlîx jî dikarin, hûn jî sola ji lingan derxin.

MEHDÎ TANRIKULU

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (104) XAÇEPIRSA

H	U	S	E	J	I	N	P	A	L
N	I	R	B	E	G	A	N	E	
E	C	N	E	B	I	R	E	P	
T	O	A	R	A	M	I			
K	R	I	S	S	Ü	K			
A	H	S	Ü	R					
A	L	T	A	X	İ	R			
L	C	A	T	E					

PEYVA VEŞARÎ → PAKREWAN

Bersiva Xaçepirsa 102'yan

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin destê me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 104'an kaseta Koma Dengê Biratî 'Narê' ye.

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.



Pênc kesên ku xelata hejmara 102'yan kaseta Baran 'Çenê çenê' qezenc kirine: İsmail Temel/Mêrsîn, Ali İmren/Enqere, Ahmet Demir/Agirî, Kendal Alpkaya/Amed, Hasan Turhan/Sêrt

Heger Sazkirina amûrên muzikê	Peywiri Şehîdek (Wêne)	Dawera Kukurtê Xuyang	Mêr Navek	Bi sîleh Noteyek	Tipek
Gelekî Cemserî	7	Şermezar Gelo	Veqetande kek Dawera iyotê	Xweli	
Gihaneke	6	Gelekî Ari yê kevnare Bi îng. çay	Bi rûsi 'erê' Tevgera hewayî		
Nexweşiye k Çiyeyeke Kurdistanê		Dawera borê Keşşel, grêz	Dawera argonê Tipek	Paşgîrek Gîndor	3
		2	Qet û ... Xilaskîrîn		
Bi kirdkî agir Dawera Azotê			Bi devokî 'ku' Tipek dengdar	4	
5	Senceq Xwarina bengehîn	Pixembere k Dawera Florê			
Tevrîk kîrîn			Dihê Tipek		
Cinavkek					
	Tipa dawîn	Mehele			

PEYVA VEŞARÎ → 1 2 3 4 5 6 7



Racenayina Refah û estanika lû

Zew bî partiyê racenayî vengê xo nêkenê, mebûsê kurdanê çebyanê vengê xo nêvejene û xo parlamento ra çebyayin ray danê. Nika jî vejyanê racenayin protesto kenê û vanê wa partî meracenyê ek nacenyê jî, wa hetê şariya racenyê. Şima o wext kofî biyê birayê lû?

N ezdiyê jû ser o ke çîseyê racenayina Partiya Refah sero benê. Peynî de Partiya Refah jî hefte wo verîn race-nê. Racenayin ser, adir kewt serdaranê Refah miyan û kamîn serdarê ci fekê xo akêrd vat: "Sistemanê demokratan de partî nêracenayî. Rastî ek kes serdaranê Refah û Partiya Refah mesilasno, kes vano qayê ê ma ra vêşî demokrat ê, ma ra vêşî haqanê mardiman, azadiyî û pêdûstî (eşitlik) wazenê.

Vînayîne ke, serdarê Partiya Refahê anê zîwan rast ê. Gerek partiyê siyasi meracenyê, ek racenyê jî, wa şar raceno. Partî racenayin karê dewlet niyo. La belê serdarê Partiya Refahê ewro, diriyî (durûfî) kenê. Çimke serdarê Refahê ke, ewro qalê demokrasi, hûqûq û haqanê mardiman kenê, wexto ke HEP, ÖZDEP, DEP, STP, EP û partiyê binî racenayî, vengê xo nêvet û racenayîne nê partiyan ca de dî.

Ancî mebûsanê Refah wexto ke, mebûsê kurdan parlamento ya tirk ra çebyay, înan jî qandê çebyayan ray eyşt (çekard). Ewro ê ke wina kerdê û pîrêskiyayê demokrasi, hiqûq, haqê mardiman azadiyî û pêdûstî. Rastî nê kerden û vatenê estanika wayirê rezî û lû anê ma vîrî.

Wayirê rezî ewneno luwa her şew yena, kewna rezî miyan û ingûra rind wena. O jî tepşeno, rezî miyan de faq nano ro. Lû şew yena ke fina ingûr buro, linga ci kewna faq û qîrena. No mabend de jew arwêş yeno û lû ra vano: "Way lû tiya çira bermena?" Lû jî vano: "Bira arwêş eza nêbermena, eza xo rê deyrî vana." Arwêş jî vano: "Way lû vengê to yo qe deyr nêmameno? Tiya senî deyr vana?" Lû vano: "Bira arwêş, eza deyr hend zerî ra vana ke, coka vengê mino wina vejyeno.

Yanê vaten û kerdenê serdaranê Partiya Refahê eynî na estanik manenê. Zew bî partiyê racenayî vengê xo nêkenê, mebûsê kurdanê çebyanê vengê xo nêvejene û xo



qandê parlamento ra çebyayin ray danê. Nika jî vejyanê racenayin protesto kenê û vanê wa partî meracenyê ek nacenyê jî, wa hetê şariya racenyê. Şima o wext kofî biyê birayê lû? Senî ke, şima kewtê faq, hema şima pîrêsiyayê demokrasi, hiqûq, haqanê mardiman, azadiyî û pêdûstîna.

Vînayîne DYP û racenayin

Racenayina Partiya Refah ser, keylê partiyan, komalanê demokratan û kesan vînayîne xo ardî zîwan. La belê ezo wazena vînayînanê DYP sero vindirî. Çimki 21'ê meng de serdaranê DYP ra Saffet Arkan Bedükî racenayîne Partiya Refah protesto kerd û vat: "Demokrasi qandê her kesî lazim a, coka gerek partiyê siyasi meracenyê. Politîkaya DYP de partî racenayin çinya û DYP racenayin qabûl nêkena".

Verdê di seran racenayina partiyanê kurdan û sosyalîstan wastê, nika jî vana: "Wa partî meracenyê." Wexto ke Partiya Demokrasi (DEP) racenyê rolo zaf gird ê DYP bi û o wext zey ewroy nêvatê wa partiyê siyasi meracenyê. La belê o Seroka DYP Ç iller vat: "Eza PKK meclîs ra çekirî. DEP racenayin kerdo heq." Ek mebûsê kurdanê ewro zîndanê Enqere de rakewnê sebebê zîndan de rakewtin DYP wa. Vaten û kerdenê DYP jî, zey vaten û kerdenê Partiya Refahê. Çimki rolo ke artêş da bi DYP ewro o qediya û nika awa vana ewro Refah racenyê meşt (siva) ma jî racenenê. Coka serdaranê DYP'yê zey serdaranê Partiya Refah fekê xo akenê û vanê: "Demokrasi, hiqûq, haqê mardiman". La belê ma zami ke ê heqê mardimanê vaten de, heqanê çeteyan û faşîstan wazenê.

MEMED DREWŞ

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLERNAVNİŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX:
(0 212) 251 90 13Gerîndeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TANBerpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESENBerpîrsê tîkiliyên bi gel re
(Halkla ilişkiler müdürü)
REFİK İNCİRBerpîrsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHIR ELDEMİRÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.
BELAVKIRIN
BİRYAY DağıtımNÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)München:
(Nünerê Giştî yê
Ewrûpayê)
Mahmut Gergerli
49 871 67 08 15Brüksel:
Medenî Ferho
32 532 721 12 03Suriye:
Jana Seyda
Helim Yûsiv
Berlin:
Silêman Sîdo
00 49 30 691 6495Hannover:
Selîm Biçûk
49 572 18 13 60Stockholm:
Robîn Rewşen
46 87 51 05 64Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49Hollanda:
S. A. Fewzî
31 104 85 55 43

Ji

Gündemê

Nirzandina hefteyê

Di dawiya sala 1997'an de û di destpêka sala 1998'an de rayedarên dewletê yên derewîn û durû ragihandin ku wê sala 1998'an bibe "Sala Demokratîkbûnê" lê mixabin em dibînin ku ji layê dewleta nijadperest ve tu gavên erênî di meha yekemîn a vê salê de nehatiye avêtin.

Wekî ku ji manşetên Ülkede Gündemê jî tê fêhmkirin hêzên leşkerî li Kurdistanê operasyonên xwe tevî ku derbeyên giran jî dixwin, didomînin. Bi tenê di operasyona ku li Çiyayê Gabarê derketibû de, li gorî daxuyaniyên leşkerî 8, li gorî çavkaniyên herêmî jî ji 15'an zêdetir leşker mirine.

Li aliyê din her çiqas sîstema cardevaniyê roj bi roj dipelişe jî, dewlet ji bo ku rê li ber danîna çekên kirêt bigire, gundiyan kurd bi koçkirin û bi mirinê tehdît dike.

Çewsandin û pest û kotekî ne bi tenê di qada şer de, her wiha di zanîngeh û qadên perwerdehiyê de jî xwe nişan dide. Roj tune ye ku faşist êrîş nebin ser xwendekarên welatparêz û demokrat. Piştî kuştina xwendekar Ümit Cihan Tarho, niha jî li Ceyhan û Giresunê xwendekarên welatparêz û demokrat bûn hedefa êrîşên "gurênboz".

Lê wisa xuya dike ku; sala 1998'an ji bo rojavahiyan, derbarê çarenûsiya pirsê kurdî de, wê bibe saleke watedar û mayînde. Vê yekê piştî penaberên kurd ku ji ber zilma dewletê, berê xwe dabûn qeraxên Îtalyayê, xwe baş diyar kir. Niha jî li Îngilîstanê bi daxwaza Îtalyayê, ji bo pêkanîna "Konferansa Navneteweyî ya Kurdistanê" hewldan û xebat bi lezgîniyê kirin. Heftaya borî yek ji girîngtirîn rûdanan jî ew bû ku; heyeta Amerîkayê di bin serokatiya Senator John Porter de parlamenterên kurd yên di girtîgehê de ne ziyaret kirin û dan zanîna ku, heta pirsgrêka kurd çareser nebe êdî ew nema gavên xwe davêjin Tirkiyeyê.

19 Rêbendan 1998 Duşem:

MIRIN LI BER DERÎ YE

Wekî tê zanîn, bi salan e ku li gundê Benîna ku girêdayî Pasur(Qulp) a Amedê ye û bi tenê bi qerneyan belavkirina xwarinê di hate kirin, ji mejûya 21 ê berfanbara 97 an û vir de ji hêla Qereqola Seyrekê ve belavkirin ji binî ve hate birîn. Ji ber vê yekê heta niha 12 zarok nexwê ketine. Li ser vê yekê roja 14 ê rêbendanê tevahiya gundiyan berê xwe dane qereqolê û gotine ku heta ambargo li ser wan ranebe, ew ji qereqolê demakevin. Piştî vê hewldanê rayedarên qereqolê dane zanîna ku anca ew dikarin bi miqdarên kêr xurekan bidin wan. Gundiyan gundê Bêniyê dadixuyînin ku di her malê de 10 kes hene û di mehekê de 5 kilo şeker, 10 kilo arvan û ji xwarinên wekî miqarîne jî 5 kilo ji hêla qereqolê ve didin wan.

20 rêbendan 1998 Sêşem:



HEYETA DYA YÊ BI DEP'YAN RE HEVDÎTIN PÊK ANÎ

Roja 19 ê rêbendanê heyeta mafên mirovan a Kongreya Amerîkayê ku di nav wan de senatorê Partiya Komarperwer John Porter û jina wî Kathriyn Porter jî hene; ji serokê meclîsa tirk Hikmet Çetin û Wezirê Karên Derve İsmail Cem re li ser pirsê kurd, demokratîkbûn, mafên mirovan û li ser girtina partiya Refahê hevdiyan pêk anîn. Tê gotin ku parlamenterê ANAP'ê Kamuran İnan ji heyetê re gotiye ku di demê kurt de, çareseriyekê hêvî nekin. Piştî re heyeta Amerîkayê ji bo ku bi parlamenterên DEP ê Leyla Zana, Hatib Dicle, Orhan Doğan û Selim Sadak re hevdiyanê pêk bîne çû Girtîgeha Enqereyê. John Porter daxuyand ku Leyla Zana di hevdiyanê de derbarê lêborîna (effîya) xwe de gotiye ku ew yek hewl-

daneke siyasî ye û xebatek vala ye ku berdana hevalên wî yên di girtîgehê de ne, di nav xwe de nahewîne.

21 rêbendan 1998 Çarşem:

LI ÎNGİLİSTANÊ KOMİTEYA KURD

Piştî daxwaza Îtalyayê hewldanên ji bo pêkanîna Konferansa Navneteweyî ya Kurdistanê bi lezgîniyê dom dikin. Li ser vê daxwazê, endamên Parlamentoya Îngilîstanê, biryar girtin ku "Komîteya Têkiliyên bi Kurdan re" ava bikin. Parlementer ji bo ku serokatiyê û endamên vî komîteyê(KAC) diyar û eşkere bikin li hev rûniştin. Di dawiya li hevrûniştinê de, ji Partiya Karkeran John Austin Walker bi piraniya dangan bû serokê 'Komîteya Têkiliyên bi Kurdan re'. Her wiha ji heman partiyê Lord Ewebury û Lord Hyletton jî bûne cigirê serokê komîteyê. Austin ragihand ku ar-



Rêlibergirtin û zordariyên li ser rojnameya Ülkede Gündemê dom dikin!

ne. Li gorî çavkaniyên herêmî, piştî êrişê gerilayan hêzên leşkerî ji herêmê ve kişiyane. Li hêla din roja 19'ê rêbendanê 5 cemseyên leşkerî, ku dixwestin ji Stewrê (Savur) ber bi Mêrdînê ve biçin, ketin kemîna gerilayan di vî peyçûnê de leşkerek miriye, 2 leşker jî birandar bûne. Her wiha gerilayên ARGK ê riya di navbera navçeyên Şemrexê (Mazıdağı) û Dêrikê de, erebe rawestandî û nasnameyên rêwiyan kontrol kirine, ji bo propoganda kirine. Hate ragihandin ku di nav 8 leşkêrên ku li Çiyayê Gabarê hatin kuştin de, kurmetê Cigirê Serokê Giştî yê ANAP ê Yaşar Okuyan bi navê Şakir Elkovan jî hebûye.

22 CERDEVANAN ÇEKÛN XWE DANÛN

Li gundê Zonî ya ku girêdayî Qosera (Kızıltepe) Mêrdînê ye 22 cerdevanan çekên xwe danin. Li hemberî vî yekê leşkeran gundî bi koçkirinê tehdît kirin. Roja 16'ê rêbendanê gundiyan bi navê Fesih Yılmaz, Abbas Vurgun, Ramazan Vurgun, Cuma Vurgun, Mehmet Yalçın, Hamdullah Ökmen, Hamdullah Bal, Reşit Oral, Nazım Temel, Sabri Kırmızıgül, Veysi Kırmızıgül, Hasan Ertur, Esat Demircan, Nuri Aydemir, Veysi Akdemir, Selahattin Aydemir, Hüsnü Aydemir, Mehmet Uncu, Mehmet Barış û Süleyman Barış bi armanca ku îstifa bikin û çekên xwe deynin, seri li fermandariya tabûra Kızıltepeyê dan. Cerdevanên ku di heman rojê de çekên xwe danin, ragihandin ku ew bi darê zorê bûne cerdevan. Li ser vî rûdanê jî roja 17'ê mehê û vir de leşker nahêlin ku gundî heywanên xwe biçêrin. Her wiha fermandarê tabûrê jî gundiyan re gotiye ku "an bibin cerdevan an jî ji vî derê biqêştin herin."



manca Komîteya wan ew e ku rastiya kurdan di qada navneteweyî de binin rojevê.

22 Rêbendan 1998 Pêncşem:

LI GABARÊ ŞERÊ DIJWAR

Di encama şera ku di navbera gerilayên ARGK û leşkêrên tirk ku hildikişiyên Çiyayê Gabarê de 8 leşker mirin, 15 leşker jî birindar bûn. Hate ragihandin ku di 20 ê rêbendanê de yekîneyên leşkeran ku ji herêmên Zivîngok, Keladersaf, Karnê û Spivyan ku derketibûn operasyonê ketin kemîna gerilayan. Piştî kemîna şerê rû daye û bi giştî 8 leşker mirine, 15 jî birindar bû-